Nivîsa Rêbiwar Kerîm Welî di rûpela 14 de

PKK û Tirkiye bi çalakiyên xwe li dû kîjan plan û armanca ne? Tirkiye ji Herêma Kurdistanê çi dixwaze û bersiva Herêma Kurdistanê çi ye?

9

دەڵێ "هونەرەکەم نافرۆشم"

مژدێن خۆی سووک ناکات



Hejmar / Nr. 119
27 Cotmeh / Oktober 2011

Rûdaw

ÇAPA EWROPA

Rojnameya Kurdên Diyaspora

Deutschland 1,50 Euro | Österreich 1,50 | Belgium 1,50 Euro | Danmark 15,00 DKK | France 1,50 Euro | Nederland 1,80 Euro | Norway 15 NOK | Schweiz 2,70 CHF | Sverige 21,00 SEK

Wanê dinya hejand

2/3 »

Wêne: DIHA

Sefereke bê perê bo Kurdistanê

Kupon 119

4 rojnameyan bikire û bileteke qezenc bike

Nav û navnîşan we: ....
....
Telefona we: ....

4 kuponên ji hejmarên cûda yên Rûdawê bibire û ji vê navnîşanê re bişîne:

Rûdaw Media GmbH
- Tîrûpişk -
Gutenbergstr 63 a
50823 Köln / Almanya

Ji kerema xwe re nav û navnîşan û telefona xwe ji bîr nekin

Bi sponsoriya
City Tower (Hewlêr)

Piştî navbeynkariya PJAK-Îranê,

Hikûmeta Herêma Kurdistanê berê xwe daye pirsgirêka PKK-Tirkiyeyê

» 10/11

Serokê Dîwana Serokatiya Herêma Kurdistanê, Dr. Fuad Hisên:

"Ligel Tirkiyeyê jî bi heman şêweyê û ji vê bêtir jî hewldan hene."

00043
4 191631 701506
43
9 771869 104000
Great Britain

Malpera Rûdawê bitikînin

Rûdaw.eu

www.rudaw.eu
info@rudaw.eu

www.arsivakurd.org

Kurdên Ewropayê ji bo mexdûrên erdhejê dest bi kampanyayan kirin

Erdheja li Wanê bû sedema xemgîniyek nezin û Kurdên Ewropayê kitin nav hewdanên komkirina alîkariyê. Heyva Sor a Kurdistanê û KOMKARê dest bi kampanyayên alîkariyê kirin.



Rûdaw (Koln)- Saziya alîkariya mexdûr û qurbaniyan Heyva Sor a Kurdistanê ji bo erdhêja Wan û Erdîşê bi taybetî li Almanya û bi giştî li welatên din yên Ewropa dest bi kampanyaya alîkariyê kir. Endamê Rêveberiya Heyva Sor a Kurdistanê Dr. Fexredîn ji Rûdawê re ragihand ku ew ligel pêdiviyên zivistanê alîkariya pere jî dicivînin û got, "Me roja duşemê bi lezgînî hinek pere şand cihê bûyerê. Em hewl didin ku vê heftê kargoya bar rêkin wê derê, lê alîkariya pere wê heta demekê bidomê."

Heyva Sor a Kurdistanê di erdhêjên berê de jî di nava Kurdên Ewropayê de alîkarî civandibû û gihandibû cihê bûyerê. Endamê Rêveberiya Heyva Sor a Kurdistanê Dr. Fexreddîn daxuyand ku wan li cihê bûyerê bi saziyên sivîl yên alîkar re pêwendî çêkirine û got, "Di navbera me de koordinasyon heye, tiştên ku em ê li vir bicivînin em ê bi alîkariya wan bigihînin kesên mexdûr."

Dr. Fexreddîn bi bîr xist ku pêdiviyên zivistanê yên wek cil, betaniye, pêlav û hwd wê tenê carekî û ew jî di nava vê hefteyê de rêkin û ne di wê baweriyê de ye ku alîkariya wan ji aliyê rayedarên dewleta Tirk ve bên asteng kirin. Dr Fexreddîn got, "Em saziyeke sivîl ya alîkariyê ne û niha ji bo her saziyên weke me karekî girîng derketiye. Me berê jî organizasyonên wiha kiriye û pirsgirêk derneketine."

Endamê Rêveberiya Heyva Sor a Kurdistanê Dr. Fexreddîn got ew ji bilî Almanya, li Holanda, Belcîka, Swîsre, Fransa, Danîmarka, Awustûrya, Swêd û Brîtanyayê di heman demê de alîkariyê dicivînin.

KOMKARê ji bo Wan û Erdîşê dest bi kampanyayê kir

Erdhêja ku li Wan û Erdîşê pêk hat, ligel saziyên kurd ên li bakurê Kurdistanê, sazî û dezgehên kurd ên li derveyê welat jî xiste nav hewldanan. KOMKARê bi armanca berhevkirina alîkariya pere roja 24ê Cotmehê bi navê "KOMKAR.eu digel gelê Wan û Erdîşê ye" kampanyaya bexşandina pere da dest pê kirin.

Dest bi kampanyayek kir û li bankeyek alman hesabê pere vekir. Serokê KOMKARê Kovan Amedî ragihand ku ev hesab wê heta mehekî vekirî bimîne û paşê li gor pêdiviyan bê bi kar anîn. Amedî got, "Dibe ku em bi vî pereyê çend xwendevanên ji wan malbatan bidin xwendin."

Serokê KOMKARê amedî da zanîn ku ew weke saziyeke kurd çi ji destê wan bê wê bikin û got, "Li welat hevalên me yên HAK-PARê niha di nava hewldanan de ne, em jî naxwazin li vir bêdeng bimînin. Li vir berhevkirina cil û firaq û betaniyan zehmet e, lê alîkariya pere hêsan e û em jî wê dikin."

Ji bo alîkariya KOMKARê:
Deutsche Bank,
Konto Nr.: 3435666,
BLZ: 76070024

Navnîşan û kontoyên Heyva Sor a Kurdistanê

HEYVA SOR A KURDISTANÊ

Almanya
Sparkasse Neuwied,
Konto: 186098
IBAN: DE 62 57 45 01 20 00 00 18 60 98
BIC: MALADE 51 NWD

Fransa:
BNP PARIBAS Bank
RIB: 30004 00782 000 10064428 64
IBAN: FR76 3000 4007 8200 0100 6442 864
BIC: BNPAFRPPPGN

Brîtanya:
Registered Charity
No: 10 93 741
Company No: 42 85 714
Bank Sort code: 20 46 60
Bank Account No: 409 12 38

Awistûrya:
Banka: BAW AG
Konto No. 030 103 14 274
BLZ : 14 000

Belçika:
Banq: 001- 324 48 96-31

Swîsre:
Post Giro: Ccp:80-17192-8

Hollanda:
Giro No 746 06 93

Swêd:
Post Giro: 22 86 76-3

Danîmarka:
Danske Bank
Konto: 184-1084

Berpirsên tirkan destûr nedan tîma alman ya alîkariyê DTRG

Piştî erdheja li Wanê bi çend saetan, tîmek alman ya alîkariyê bi navê "Disaster Response Team Germany (DTRG)" berê xwe da firokexaneya Berlînê û xwest bi tîmeke 10-kesî bifire herêma erdhejê. Lê beriya ku tîm bifire, Saziya Parastina ji Karesatan a Tirkiyeyê (AFAD) bi rêya şîrketa Turkish Airlines tîma alman agahdar kirin ku "pêwîstiya wan bi alîkariyê tune". Li ser vê yekê tîma alman neçar ma ku hewldana alîkariyê bi dawî bîne.

Derbarê vê helwesta berpirsên tirk de, Andreas Teichert yê berpirsê Tîma Karasatê ya Rojhilatê Asyayê xemgîniya xwe ji Rûdawê re diyar kir û got ku "di karesatên bi vî rengî de li ser pişta qurbaniyan siyaset tê meşandin". Andreas Teichert got: "Di rewşeke bi vî rengî de ji me re ne girîng e qurbanî ji kîjan netewe an jî olî ne, ya girîng ku em weke saziyek xêrxwaz dixwazin alîkariya mexdûran bikin." Li gor Teichert sedemên vê helwesta Tirkiyeyê siyasî ne û dixwaze xwe weke welatekî bi hêz nîşan bide û wiha got: "Li gor min dibe ku rola PKKê jî di helwesta rayadarên tirk de hebe, li rojhilatê Tirkiyeyê gelek Kurd dijîn û di nav wan de gelek alîgirên PKKê jî hene. Em saziyek bêteref in û dûrî hesten siyasî tevdigerin, ji bo me hemû mirov in û mexdûr jî kêfxweş in ku alîkariya wan bê kirin."

Banga alîkariyê ji saziyên almanî

Li aliyê din çendîn saziyên alîkariyê yên alman, wekî "Diakonie Katastrophenhilfe" û "Caritas international" banga alîkariyê û bexşandina pereyan kirin. Ev herdu rêxistinên alman bi hevkariya saziya alîkariyê ya tirk "Support to Life" alîkariyê digihînin herêmên erdhejê. Saziya alîkariyê ya almanî "humedica e.V." jî roja duşemê bi tîmeke4-5 kesî çû cihê erdhejê.

Rûdaw

Rojnameyeke siyasî û heftane

Xwedî
Rudaw Media GmbH

Sernûser
Ako Mihemed
akopress74@yahoo.com

Rêvebirê Nivîsînê
Nasredîn Akyol
nasredin@rudaw.eu

Redaksiyon
Firat Kelehkî
kelehkî@yahoo.com

Mehmet Sebatli
sebatli@hotmail.com

Besam Mistefa
wardoz@gmail.com

Mihemed Tahir
mtahir2011@windowslive.com

Dîzayner
Hamdullah Yumlu

Îdare û belavkirin
Mustefa Sefîq Edilbî
gare2005@hotmail.de

Şêwirmendê yasayî û aborî
Ayhan Çîftçî

Marketing û reklam
Mansour Sedghi
m.sedghi@rave-online.org

Navnîşan
Rudaw Media GmbH
Gutenbergstr. 63a
50823 Köln/Germany

Pêwendî
Telefon: +49 (0) 221-26 00 40 02
Telefax: +49 (0) 221-26 00 49 81
www.rudaw.net / www.rudaw.eu
info@rudaw.eu

Belavkirin / Vertrieb:
Axel Springer Vertriebsservice GmbH
Süderstraße 77
20097 Hamburg
www.as-vertriebsservice.de

Rûdaw ji bo nivîsên ku bi nav tên weşandin ne berpirsyar e.

© Hemû maf parastî ne

www.arsivakurd.org

Wanî ji helwesta çapemeniya tirk aciz in

“Çima dîmenên şaş nîşan didin? Ka dewlet, ka alîkarî?”

Adil Harmanci Wan

Erdheja ku di 23ê Cotmehê de li Wanê rûda, ji aliyekî ve bû sedemê mirin û birîndarbûna bi sedan kesan û ji aliyê din ve jî bû sedem ku Kurd ji weşanên çapemeniya tirk aciz bibin û nerazîbûniyên xwe nîşan bidin. Rayedarên dewletê destpêkê nehîştin ku alîkariya navnetewî bê, Parlemena Ewropayê jî helwesta hikûmeta Erdogan rexne kir.

Li gor daxuyaniyên fermî û heta amadekirina vê nûçeyê, li Wanê û li Erdîşê hejmara miriyan gihiştibû 460, hejmara birîndaran jî gihiştibû hezar û 521 kesan. Hejmara avahiyên ku bi temamî an jî hinekî xira bûnê li Wanê û li Erdîşê bi giştî 2 hezar û 262 ye. Lê çavkaniyên herêmî didin zanîn ku hejmarên rastîn zêdetir in.

Rûniştevanekî ji Erdîşê, bi navê Ercan Oksuz, ragihand ku li navçeyê hemû avahiyên 5 qat xira bûne. Oksuz destnîşan kir ku bi taybetî li cihên wek qehwexane û kafeteryayan zêdetir kes mirîne û birîndar bûne. Li navenda Wanê di 5 cihên cûda de xebatên lêgerîn û xilaskirinê didomin. Hevwelatiyê bi navê Kerem Kaya daxuyand ku ev 3 roj in xizmekî wî di bin kavil û bînayên xirakirî de maye û got, “Tenê xebatkarên şaredariyê di karên xilaskirinê de cih digirin.”

Li aliyê din ji ber ku alîkarî ji aliyê hêzên dewletê baş nayê kirin, gelek hevwelatî bi derfetên xwe li çareseriyê digerin. Ji ber ku kon nayên belavkirin hevwelatiyên ku malên wan xira bûne bi bihayên bilind ji xwe re tiştan dikirin û pê konan çêdikin. Ji ber ku erdhejên sivik didomin, gelek hevwelatî ev 4-5 şev in li derve radizên.

Li Wan û Erdîşê ji ber kargeh û dikan hê nehatine vekirin û alîkarî baş nehatiye kirin, hevwelatî ji yek du firinên vekirî bi bihayekî bilind ji xwe re nan dikirin. Berê bihayê nan 600 quriş bû, niha bûye 2,5 YTL.

Wêne: DIHA

Wêne: AF

Di vê erdhejê de tiştekî ku bala gelek kesan kişand ew bû ku bêhtir avahiyên bilind xirabûne. Yek ji wan avahiyên ku zererên mezin dîtin, nexweşxaneya ku muhendîsan destûra vekirina wê nedidan bû. Lê ew nexweşxane bi fermana Serokwezîr Erdogan hatibû vekirin.

Helwesta dewletê

Derbarê erdhejê de şaşitiya yekem Saziya Erdhêjê li Tirkiyeyê (Kandilli Rasathanesi) kir. Dewletên Yekbûyî yên Amerîka ragehand ku bihêzbûna vê erdhêjê 7.3 bû, lê Kandilli Rasathanesi ev hejmar weke 6.6 ragihand. Muhendîsê bi navê Îhsan Serkan ragihand sedemê nîşandana kêm ya pîleya erdhêjê ew e ku dewlet naxwaze ev herêm bibe herêma karesatê. Serkan got ku “Eger pîleya erdhêjê li jorî 7 be, ew herêm dikeve nava herêma karesatê. Dibe ku ev yek nexwestibin, lewma daxuyaniyek wiha kirine.”

Serokwezîr Erdogan jî li Wanê ji çapemeniyê daxwaz kir ku nûçeyan zêde mezin nekin. Rûniştvanê bi navê Suleyman Genç jî daxuyand ku çapameniyê daxwaza Erdogan bi cîh anî û tenê çîrokên hinek kesan dide û girîngiya bûyerê vedişêre. Genç got “Tenê çend dîmenên dramatîk didin û dibêjin me ewqas kes xilas kirin, ev kes zewicandî bû, ezeb bû, wiha bû, lê nabêjin ka dewlet li kû ye, alîkarî çima tune, walî çi dike? Dibêjin maseya krîzê heye, ka li kû ye, çima nîşan nadin? Ji ber ku Serokwezîr hat vir û ji hemûyan ev yek xwest.”

Hevwelatiyên li Wanê ji daxuyaniyên nijadperestan jî pir aciz bûne. Di kanala ATVê de Muge Anli û çendîn kesên din di bernameyên zindî de gotibûn ku, “Kurdan ev yek heq kirine”. Di malperên civakî yên li ser înternetê wek twitter û facebookê de çend rojên pêşî nijadperestan kêfxweşî bi bûyerê dikirin û ev yek jî bû sedemê pevçûna navbera Kurd û Tirkan li ser malperên înternetê. Roja 25ê Cotmehê xelkê Wanê ji ber gotinên Muge Anli êrîş birin ser otomobîla ATVê ya ku weşana zindî dikir. Kameraman û nûçegihanê ATV ragihandin ku gotinên Anli yên bê wate û yên dijwar bûn sedem ku ew nikaribin li Wanê karê xwe bikin.

Parlemena Ewropayê helwesta Erdogan rexne kir

Serokên grûbên siyasî li Parlemena Ewropayê (PE) helwesta hikûmeta tirk ya li himberê alîkarîkirina navnetewî rexne kirin. Serokê koma sosyalîstan li PE Martin Schulz ragihand, “Erdogan dikare alîkariya derve qebûl neke, lê wê demê divê bi lezgînî alîkariya hemû qurbaniyan bike.” Schulz got PE amade ye ku ji bo Wanê alîkariyê bike. Hevseroka koma Keskan ya Parlemena Ewropayê Rabeca Herms jî bi bîr xist ku heta 25ê Cotmehê ti alîkarî negihane qurbaniyan, lê Erdogan jî nahêle alîkarî ji derve bê. Hevserokê koma Keskan Daniel Cohn-Bendit jî helwesta hikûmeta Erdogan rexne kir û got, “Divê ji bo hemû egeran em wek PE ji bo alîkariyê amade bin.”

Barzanî 1 Milyon Dolar bexşand

Bi armanca alîkariya rûniştevanên Wanê ji derveyî Tirkiyeyê hewldanên alîkariyê hatin kirin, lê rayedarên dewleta tirk gelek daxwazan red kirin. Roja 25ê Cotmehê Hikûmeta Herêma Kurdistanê 1 Milyon Dolar bexşand Heyva Sor a Tirkiyeyê. Cihgirê Serokê Hikûmeta Kurdistanê Azad Berwarî roja 25ê Cotmehê serdana konsolxaneya Tirkiyeyê li Hewlêrê kir û daxuyand ku weke Hikûmeta Herêma Kurdistanê ji bo hemû alîkariyan amade ne. Berwarî li ser navê Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî 1 Milyon Dolar teslîmê rayedarên konsolxanayê kir.

Di 80 salên dawî de li bakurê Kurdistanê erdhêj

6ê Gulanê 1930-Colemêrg: Di vê erdheja li ser sînorê Colemêrgê de 2 hezar û 514 kes mirin. Bihêzbûna wê 7,2 bû.

26ê Kanûnê 1939 Erzincan: Ev erdhej di dîroka sed salê dawî de ya herî mezin bû; di zivistanekî serma de pêk hat û di encam de 32 hezar û 962 kes mirin. Bihêzbûna wê 7,9 bû.

***31ê Gulanê 1946,* Varto - Xinûs:** Di encam de 839 kes mirin, 349 kes jî birîndar bûn.

19ê Tebaxê 1966, Varto: Ev erdhej ji ya berê bihêztir û mezintir bû û di encam de 2 hezar û 394 kes mirin û 1 hezar û 489 kes jî birîndar bûn. Li gor pîvana Richterê bihêzbûna wê 6,9 bû. Salek beriya wê jî erdhejeke ku bihêzbûna wê 4,0 bû pêk hatibû û 12 miribûn.

6ê Îlonê 1975, Licê: Di encam de 2 hezar û 385 kes mirin, 3 hezar û 339 kes jî birîndar bûn; li gor pîvana Richterê hêza wê 6,9 bû.

***24ê Kanûnê 1976,* Wan-Çaldiran-Muradiye:** Ev jî yek ji erdheja herî mezin bû û hêza wê 7,2 bû; hejmara miriyan 3 hezar û 840, hejmara birîndaran jî 497 kes bû. Bi hezaran kes bê mal man.

30yê Mijdarê 1983, Erzirom-Qers: Bihêzbûna vê erdhejê 6,8 bû û bû sedemê gelek mirî, birîndaran û xirabûna malan. Hejmara miriyan hezar û 155 kes, hejmara birîndran jî hezar û 142 kes bûn.

13ê Adarê 1992, Erzincan: Li gel Erzincanê ev erdhej li Dêrsimê jî pêkhat û tê de bi giştî 653 kes mirin, hejmara birîndaran jî 3 hezar û 850 kes bû. Bihêzbûna wê 6,8 bû.

27ê Çileyê 2003, Dêrsim-Pilêmor: Bihêzbûna vê erdhejê 6.2 bû, tê de kesek mir û 50 kes jî birîndar bûn.

1ê Gulanê 2003 Çêwlik: Ev erdheja ku bihêzbûna wê 6.4 bû, bû sedemê mirina 176 kesan û birîndarbûna 6 hezar kesan.

23ê Cotmehê 2011 Wan: Dema ku nûçe amade dibû (25.10.2011: saet 23:45) hejmara miriyan 460 û ya birîndaran jî hezar û 352 bû. Bihêzbûna wê 7.2 ye.

www.arsivakurd.org

Kongreya Niştimanî ya Kurdên li Sûriyê li Qamişlo dicive:

Nakokiyên navbera partiyan dibin sedema lawaziyê

Besam Mistefa

Kongreya niştimanî ya kurdî li Sûriyê, ku nêzîka 6 meh in amadekariyên wê tên kirin, biryar e di dawiya vê mehê de bê sazkirin, lê ji ber nakokiyên di navbera aliyan de û vekişîna hinek grûban ji beşdarîkirinê, ligel egera şikestanînê rûbirû bûye.

Derbarê şêweya beşdarîkirinê di kongrê de, ku wisa derdikeve astenga serekî li pêşber kongrê be, endamê polîtburoya Partiya Yekîtî ya Kurd li Sûriyê Fûad Elîko berê ragihandibû ku "rêjeya beşdarbûna kesayetiyên serbixwe di kongrê de nêzîka ji sedî 60 dibe." Tiştê dimîne ji partî û saziyên sivîl re tê danîn.

Hê ji niha ve, gelek ji aliyên ku ji kongrê hatine dûrkirin yan paşdekişana xwe ragihandine, bangeşeya wê yekê dikin ku kongre nûnertiya hemû çîn û tiwêjeyên Rojavayê Kurdistanê nake û amadekarên wê bi dûrxistin û paşguhxistina hinek aliyên siyasî û bo berjewendiya hinek aliyên din, gunehbar dikin ku.

Sekreterê Partiya Yekîtiya Kurdistanê Ebdulbasit Hemo ku berî demekê ji partiya Elîko cuda bû, û tevlî kongreyên Stenbolê bûye, yek e ji wan partiyên ku ji niha ve rexneyan li kongrê digirin. Lê bi baweriya Partiya Yekîtiya Kurd li Sûriyê, ti hebûna partiya Ebdulbasit Hemo li Rojavayê Kurdistanê nîne. Hemo ji Rûdawê re ragihand ku kongreya niştimanî ya Kurdî li Sûriyê nikare nûnertiya daxwazên gelê kurd bike, "nemaze ku helwesta kongrê ji şoreşa gelê Sûriyê û rêjîma Esed û rûxandina wê rêjîmê, û derbarê destnîşankirina daxwazên gelê me ne eşkere ye. Rêjeya nûnertîkirinê di kongrê de mafê hinek aliyan dixwe û zêdetir dikeve xizmeta partiyên siyasî."

80 nûnerên hizbî û 150 kesên serbixwe tevlî kongreyê dibin

Lê sekreterê Partiya Yekîtiya Kurd li Sûriyê Îsmail Heme van gotinên Hemo red dike û dibêje: "Kongra niştimanî ya Kurdî di van rojan de li Qamişlo tê sazkirin." Herwiha kifş kir ku rêjeya kesên serbixwe ji rêjeya partiyan zêdetir dibe: "80 hizbî û nêzîka 150 kesên serbixwe di kongrê de beşdar dibin. Beşek ji ciwanên kurd jî beşdar dibin. Beşekî din amade nabin ji ber hinek nakokiyên di navbera me de, ew daxwaza hinek tiştan dikin ku me nedikarî wan bicih bînin, dixwestin di komîteya amadekar de bin, ku me berî 2 mehan çêkiribû, bi baweriya min hinek daxwazên wan tacîzî bûn."

"Hinek partî daxwaza rûxandina rejîmê nakin"

Sekreterê Partiya Yekîtiya Kurd li Sûriyê, ku ji Rojavayê Kurdistanê bi telefonê ji Rûdawê re daxivî, got jî: "Ciwanan digotin bila kongre seranserî be û hemû alî tê de amade bin, lê ev zehmet e, me hewl da partiyên kurd yên derve jî bên, lê wan hejmareke zêde dixwestin, ev jî nedibû. Kesên serbixwe di kongrê de ji sedî 60 in, lê PYDê daxwaza 62 kursiyan ji xwe re dikir û me jî qebûl nekir."

Heme herwiha red kir ku ciwanên kurd ji ber bilindnekirina slogana rûxandina rêjîma Esed tevî kongrê nabin û got: "Ew xwe dixapînin, divê em di kongrê de van tiştan gotûbêj bikin. Raya partiyan jî di vê xalê de cihê ye, Yekîtî û Azadî daxwaza rûxandina rêjîmê dikin, lê hinek partiyên din vê daxwazê red dikin."

Lê sekreterê Partiya Yekîtiya Kurdistanê Ebdulbasit Hemo ku bo kongrê nehatiye vexwendin, dibêje kongre nûnertiya daxwazên gelê kurd nake: "Nikarin alîkariya şoreşê û daxwaza rûxandina rêjîma Esed bikin bi awayekî vekirî. Ger hemû alî helwesteke hevbeş û eşkere nîşan bidin pir baş dibe, lê bawer nakim ku tiştekî bi vî rengî bibe. Nakokî di navbera hêz û partiyan de pir e û gelek alî hene nikarin helwestên bi cesaret nîşan bidin."

Li himber vê bangeşeyê jî, aliyên ku ligel serxistina kongreyê ne, wisa dibêjin ku kongre nûnertiya hemû çîn û tiwêjeyan dike.

Nûnerê Partiya Azadî ya Kurd li Herêma Kurdistanê Mehmûd Erebo, qala amadekariyên kongrê kir û got: "Me li ser rêjeya beşdarbûnê lihev kir, rêjeya kursiyên partiyan tenê ji sedî 44 e û rêjeya ji sedî 56 bo saziyên civaka sivîl e, bi vî rengî hemû çîn û tiwêjeyan beşdar dibin."

Lê ligel nêzîkbûna dema kongreyê, PYD demeke bi nêzîktiya ji hikûmeta Sûriyê jî tê gunehbarkirin, roja 20ê Cotmehê di daxuyaniyekê de ragihand ku ew tevlî kongrê nabin.

PYD: Em hê jî pêkut in li ser nebeşdarbûnê.

Her çiqasî tê gotin ku civata partiyên siyasî, sîwana ku 11 partiyên Rojavayê Kurdistanê PYD jî di nav de lixwe girtiye, bi daxwazên PYDê derbarê rêjeya nûnerên wê di kongrê de razî bûbin û li ser wê bingehê jî PYD ji biryara beşdarnebûnê paşkez bûye, lê serokê PYDê Mihemed Salih Muslim ji Rûdawê re ragihand: "Em hê jî pêkut in li ser wê yekê ku em beşdar nebin. Me dixwest kongrekî netewî li ser asta rojava bê kirin, lê ev ne kongrekî netewî ye, çend çînên çalak ên civakê hatine paşguhxistin, lewma me biryara xwe da tevlî nebin, dema rê dan hemû nûnerên civaka kurd beşdar bin, wê çaxê em jî beşdar dibin."

Grubên ciwanên kurd bi awayekî giştî ragihandine ku ew tevlî kongrê nabin û weke "kongrê partiyan" binav dikin.

Hevpeymaniya Xortên Sewa: Ev kongre xizmeta daxwazên kolana kurdî nake.

Berdevkê Hevpeymaniya Xortên Sewa Ciwan Yûsiv derbarê helwesta lawên kurd ji kongreya niştimanî ji Rûdawê re got: "Em tevlî ti civîn û kongreyekî nabin ger daxwaza rûxandina rêjîma Beşar Esed neke. Partî dibêjin helwesta xwe yekalî bikin, gelo ligel mabûna rêjîmê ne yan rûxandina wê? Bi baweriya me kongreyekî bi vî rengî ne di xizmeta daxwazên kolana kurdî de ye. Ev kongre xwîna hevwelatiyên kurd û ereb ên Sûriyê liberçav nagire."

Herwiha got ku ew ne ji ber hejmara kursiyan beşdar nabin, lê "ji ber mêkanîzima birêvebirina kongrê ji aliyê partiyan û herwiha slogana serekî ya kongrê. Partî dibêjin ew daxwaza guherandina sîstema ewlehî ya rêjîmê dikin, lê ew ji bo veşartina rastiyan vêya bikar tînin û newêrin daxwazên xwe bi awayekî vekirî bilêv bikin. Em daxwazê ji van partiyan dikin ku vê siyaseta xwe ya kevin biguherin û xelkê bi van têgehan nexapînin."

Reklam
Bi me cihêwaz bibin.
Ji bo reklam, dîzayn û çapkirinê em di xizmeta we de ne.
Reklama televizyon û rojnameyan, flayer, afîş, name, eşyayên xelatan, kovar, pirtûk, malperên înternetê, dawetname…htd.
Bi kurtasî ji bo her pêwîstiyek we di aliyê reklam û çapkirinê de…
Hûn jî xwe bighînin me…
Hûn jî cihêwaziyê hîs bikin!
graf-adolf-str. 70a
40210 düsseldorf
tel.: 0211 - 17957982
fax: 0211 - 17957983
www.dassign.de
info@dassign.de
DAS | SIGN®
werbeagentur & verlag gmbh
mobil : 0173 - 270 67 81

Rûdaw li hevkarên nû digere
Rûdaw tora xwe ya hevkaran berfireh dike
Rûdaw ji bo ku hîn bêtir û ji nêzîk ve jiyana Kurdên Ewropayê bişopîne, li hevkar û peyamnêrên nû li hemû welat û bajarên Ewropayê digere. Baş zanîna bi kurdî şert e ji bo hevkariyê.
Kesên eleqedar dikarin serî li Rûdawê bidin:
info@rudaw.eu

www.tirejkurd.org

Operasyonên girtina KCKyiyan rewşa Tirkiyeyê aloz kirin

» Doç. Dr. Kilinç: AKP dixwaze bi van operasyonan ramana çareseriya xwe ferz bike.

Hêmin Xoşnaw

Operasyona girtina siyasetvanên kurd di bin navê KCK-Tirkiyeyê de ku ev du sal in didome, rewşa nebûna baweriyê di navbera Kurd û Tirkan de û alozbûna rewşê kûr dike.

Koma Civakên Kurdistan KCK di sala 2005ê de li Qendîlê hat damezrandin, armanca damezrandina wê nûkirin û nûavakirina PKKê bi awayekî nû bû. Ramana damezrandina KCKê ji aliyê Serokê PKKê Abdullah Ocalan li Îmralî hat darêştin. Armanca KCKê weke di beyannameya wê de hatiye, komkirina hemû partî û rêxistinên kurdî ye di çarçoveya sîstemeke îdarî de bi şertekî azadiya rêxistinî û biryara her rêxistinekê hebe, lê di vî alî de tenê rêxistinên girêdayî PKKê weke PÇDK, PYD û PJAK tê de kom bûne.

Piştî derbasbûna 4 salan di ser damezrandina KCKê re, di 14ê Nîsana 2009ê de, polîs û hêzên ewlekariyê yên Tirkiyeyê di bin navê `dosya KCK-Tirkiyeyê` de dest bi kampînekê kirin û 72 siyasetvanên kurd girtin, ku sê ji wan cîgirên hevserokê DTP ya qedexekirî bûn, di 11 û 17ê Hezîrana heman salê de kampîna dûyem a girtina 18 berpirsên DTPê destpê kir.

Her çiqasî wezîrê navxwe yê Tirkiyeyê Îdrîs Naîm Şahîn, girtiyên dosya KCKê weke 700 kesan texmîn dike, lê li gor BDPê, hejmara girtiyên vê dosyê ji 700 kesan zêdetir e. Cîgira Hevserokê BDPê û berpirsa dosya mafên mirovan a BDPê parêzer Meral Daniş Beştaş ragehand, ji roja 14ê Nîsana 2009ê û heya niha 7 hezar û 748 kes bi navê endamên KCKê hatine girtin. Ji vê hejmarê jî 3 hezar û 895 kes hatine zîndankirin.

Li gor Beştaş, di 6 mehên dawî yên îsal de zêdeyî 4147 endam û berpirsên BDPê hatine desteserkirin, 548 ji wan jî bi fermana dadwer hatine zindankirin. Di nav van girtiyan de 29 endamên civatên şaredariyan in, 10 şaredar û 8 cîgirên şaredaran, 2 şaredarên berê jî hene. Ji bilî wan, dosya çend şaredarên diyar ên BDPê weke Serokê Şaredariya Mezin a Amedê Osman Baydemir û Serokê Şaredariya Sûrê ya Amedê Abdulla Demirbaş li dadgehê hatiye vekirin.

BDP: Heya niha 7748 kes wek endamên KCKê hatine girtin, 3895 kes hatine zindankirin

Ji Zanîngeha Stenbolê Doç. Dr. Ferhat Kentel rexneyan li girtina siyasetmedarên kurd digire û dibêje: "Zindankirina kesên ku bi riya hilbijartinan postên xwe wergirtine, civak û siyasetê berbi xetimînê dibe. Hinek kes van operasyonan bicih tînin ku pêdiviya wan bi şer heye, di heman demê de operasyonên KCKê ji lojîka şer bingeh digirin."

Bi baweriya Doç. Dr. Nilgun Toker Kilinç ji Zanîngeha Ege, armanca operasyonên KCKê amadekirina meydana siyasetê ye bo AKPê: "AKP dixwaze bi van operasyonan ramana çareseriya xwe ferz bike, lê ramana çareseriya AKPê nayê qebûlkirin, jiber ku armanc tê de lawazkirin û bêbandorkirina siyaseta kurdan e."

Operasyonên KCKê tenê du heftiyan piştî hilbijartina şaredariyan destpê kirin, ku BDPê karî 98 şaredariyan bibe, bi vî rengî jî şaredariyên zêdetir li bakurê Kurdistanê ji aliyê BDP ji AKPê hatine derxistin.

Hinceta dezgehên êminiyê bo bicihkirina vê operasyonê ew e ku qaşo armanca "KCK-Tirkiye" damezrandina dezgeha dewletî ye di nava dewletê de, berê jî medyaya Tirkiyeyê belav kiribû ku çend kampên birêvebirina endamên KCKê li Tirkiyeyê bi dûriya 10 kîlometroyan ji Çelê û Colemêrg li deverên çiyayî hatine damezrandin û gefan li wan kesan dikin ku deng nadin BDPê, herwiha van kampan dest bi kampîna komkirina bac û hevkariya darayî kirin.

Bi dîtina mamosteyê Zanîngeha Bahçeşehîr Ercan Çîtlioglu, KCK ne tenê rêxistineke siyasî ye, lê pêkhateyeke dewletî ye. Di nav vê pêkhateyê de dadgeh, artêş, bac, perwerde û polîs û asayîş hene: "Peymannameya damezrandina KCKê bi awayekî eşkere ji me re dibêje, em rê nadin li wê erdnîgariya ku desthilata me li ser dibe sazî û dezgehên dewletê hebin."

Şeva 19ê Cotmehê gerîllayên PKKê di encama êrîşkirina ser leşkergeha Bilêcan li devera Çelê, mezintirîn ziyan piştî 1993ê gihand artêşa Tirk. Li gor mikurhatina serokayetiya erkanê artêşa Tirk di vî şerî de 24 leşker mirin û 18 jî birîndar bûn, lê berpirsê ragehandina hêzên parastina gel HPG baskê leşkerî yê PKKê Dozdar Hemo kuştî û birîndarên artêşa Tirk weke 100 kesan wesif kir.

Ev êrîşa PKKê tenê çend rojan piştî kampîneke nû ya girtina siyasetvan û endamên BDPê hat. Bi baweriya gelek kesan sedemê êrîşa PKKê li ser leşkergeha Bilêcan operasyona KCKê ye, Çîtlioglu got: "Her ku diçe PKK îzole dibe û tê veqetandin, lewma êrîşên xwîndar bicih tîne."

Bi baweriya pisporê pêwendiyên navdewletî Erol Goka, girtina siaysetvanên kurd sedemekî serekî ye bo destpêkirina êrîşên vê dawiyê yên PKKê: "Bi baweriya gelek kesan li Tirkiyeyê êrîşa vê dawiyê ya PKKê reaksiyoneke li dijî operasyona KCKê. Osman Kawlar ku yek ji dewlemendên Tirkiyeyê ye vekirî ev yek got. Dibêje hinek kes girtine ku ti têkiliya wan bi KCKê nîne."

Hikûmeta AKPê bi serokatiya Recep Tayyip Erdogan çend caran tekez kir ku meseleya operasyona KCKê ne biryara wan e û dezgehên ewlehiyê vî karî dikin. Lê Erol Goka vê operasyonê weke karê hikûmetê dibîne: "Li gor hikûmetê bo destpêkirina vebûnê divê teror bê ragirtin. Bo vêya jî mantiqa hikûmetê ew e wan alî û kesan ji nav bibe ku alîkarî û piştgiriya terorê dikin."

Lê Ercan Çîtlioglu, derbarê rewatî û nerewatiya operasyonên KCKê dibêje: "Dibe ku di nav girtiyên dosya KCKê de hinek kes hebin ku hatibin xapandin, hinek kes hebin ku nizanin ji ber çi bûne edamên KCKê, lê yê ku wan ji hev cuda dike dadgeheke serbixwe ye."

Şirove

Şer, kuştin û nijadperestî

Ahmet Dere

Ev 30 sal in ku li welatê me şer diqewime. Di vî şerî de bi hezaran kesan jiyana xwe ji dest dane, hewqas jî birîndar bûne û malwêranî çêbûye.

Piştî çalakiya gerîlla ya li navçeya Colemergê Çelê pêkhatî û têde bi dehan (li gorî dewleta tirk 24, li gorî PKKê jî 89) leşker hatin kuştin, artêşa tirk dest bi operasyonan kiriye. Li gorî agahiyan, heman operasyon derbasî axa Başûrê Kurdistanê jî bûne. Wiha dixuyê ku wê ev operasyona dewleta tirk demdirêj be.

Di daxuyaniyên rayedarên dewleta tirk de tenê gefên kuştinê û qirkirinê hene. Ew dixwazin bi rêya van operasyonan dawî li hêzbûna PKKê bînin. Ji bo bigihijin armanca xwe, kuştin ji bo wan rewa ye. Bêguman rayedarên heman dewletê baş dizanin ku tenê PKKyî û Kurd nayên kuştin, herwiha leşker jî têne kuştin, agir bi malên malbatên tirk jî dikeve.

Dema ku artêşa Tirk li Kurdistanê operasyonan dimeşîne, li rojavayê Tirkiyeyê jî çalakiyên nijadperestan gur dibin. Di nava van çend rojên borî de bi dehan avahiyên BDPê bûne hedefa çalakiyên nijadperestan û di heman çalakiyan de hin rayedarên BDPê hatine birîndar kirin. Herwiha, di çarçoveya operasyonên KCKê de jî hejmareke mezin BDPyî hatine girtin.

Dewleta Tirk bi hêzên xwe yên leşkerî û siyasî ketiye nava pêvajoyeke taybet. Li gorî Cîgirê Serokwezîr Bulent Arinç, fermandarên payebilind yên artêşê sond xwarine ku ew dawî li PKKê bînin. Ev tê çi wateyê ? Bi van gotinan tenê kuştin tê hişê mirov. Yanî dewleta tirk dest bi operasyoneke kuştinê kiriye, kes nizane ka wê kengî û li kû derê bisekine.

Li kû dibe bila bibe, şer dikuje, wêran dike û birînên pir kûr çêdike. Di nava şeran de mirov dikare hin cudahiyan bibîne; şerên heq û neheq hene. Lê belê piraniya şeran xwediyê armancên neheq in. Şerê ku dewleta tirk li Kurdistanê meşandiye û niha jî dimeşîne, li ser hîmeke neheq e. Lewre divê mirovahî li dijî vî şerî derkeve û nehêle ew birînên heyî kûrtir bike. Ji bo ku ev pêvajoya kustinê bê sekinandin, di vê demê de kar û barekî mezin dikeve ser milên rewşenbîrên kurd û tirk jî.

Çendî di axa başûrê Kurdistanê û herwiha di Botanê de hêzên gerîlla xwedî derfetan bin jî, divê PKK jî di vê pêvajoyê de bi berpirsyartiyeke mezin tevbigere û rê nedê qirêjiyên dewletê. Pêwîst e were zanîn ku dema mirov mentalîteya rayedarên dewleta tirk digire ber çavan, kuştina leşkeran jî nabe sedema çareseriya pirsgirêka kurd.

Erdheja ku li Wanê qewimî di dilê hemû Kurdan de xemgîniyekê mezin çêkir. Ez ji hemû gelê kurd û bi taybetî jî ji gelê me yê Wanê sersaxiyê dixwazim. Di demên wiha de gotin têra îfadekirina hestan nakin.

www.arsivakurd.org

Çiyayên Alpê dawî li xeyalên Sîpan Osman anîn

Dilbixwîn Dara

Pîlotê kurd yê ciwan Sîpan Ebdo Dêrikî ku bi navê Sîpan Osman dihate naskirin, roja 14ê Cotehê tevlî kesekî din li firokeyê siwar bû û berê wê da ser Çiyayên Alpê li Swîsreyê. Ji ber rewşa hewayê ya xerab, firokeya wî 30 deqeyan piştî rabûnê ket xwarê û ew û kesê din yê 40 salî tê de mirin. Bûyer li navçeya Newchatel çêbû.

Firokeya Sîpan Osman wê bifiriya Amiens li Fransayê. Xanima Sîpan Osman, Ona Floria got ku firokeya ji coreyê Piper ji ber rewşa hewayê ya gelekî xerab ji kontrolê derketiye û firoke ketiye xwarê û li erdê parçe bûye.

Sîpan Osman ji rojavayê Kurdistanê, ji bajarê Dirbêsiyê bû. Ew di sala 1982yê de ji dayîk bûbû û ev 13 sal bûn ku li Îngilîstanê, li bajarê Leeds dijiya û li wê derê beşê civak û felsefe li zankoyê xelas kiribû. Sîpan Osman herwiha perwerdeya pîlotiyê jî dîtibû û hêviya wî ew bû ku rojekê ji rojan bibe pîlotê balafireke mezin.

Sîpan Osman di nava Kurdên Îngilîstanê de bi rewşenbîrî, welatparêzî û kurdbûna xwe di hate naskirin. Ew di gelek konferansan de li ser çareserkirina pirsa kurd axivîbû û semîner pêşkêş kiribûn.

Heta amadekirina vê raportê termê Sîpan Osman radestî malbata wî nehatibû kirin. Termê Sîpan Osman wê li bajarê jidayîkbûna wî, li Dirbêsiyê bê veşartin. Sîpan Osman birayê hunermendê kurd yê naskirî Cemal Evdo (Mîrê Hêkan) bû.

5. Festîvala Fîlmên Kurdî li Frankfurtê li dar ket

"Armanc pêşkêşkirina şaristanî, çand û hûnera kurdî ye..."

Wêne: Rûdaw

Navenda Çanda Mezopotamya û Yekîtiya Xwendekarên Kurd festîvala fîlman organîze kirin

Canê Omer Frankfurt

Di van salên dawî de sînemaya kurdî gelek gavên erênî avêtin û fîlmên kurdî li Ewropayê çendîn xelat wergirtin, bi taybetî piştî azadiya başûrê Kurdistanê û mercên ku hatin gûherandin, weke pêşketina medya kurdî, lidarxistina festîvalên fîlmên kurdî û serkeftina gelek fîlman di festîvalên navneteweyî de.

Ji 20-23.10.2011ê de li bajarê Frankfurtê (Almanya) 5. Festîvala Fîlmên Kurdî ya Frankfurtê hate lidarxistin. Festîval ji aliyê Navenda Çanda Mezopotamya û Yekîtiya Xwendekarên Kurd (YXK) û Filmforum Höchst hate amadekirin.

Îsal 15 fîlm beşdarî festîvalê bûn. Festîvalê roja pêncşemê destpêkir, bi konsertek Koma Hîvron berdewam kir û piştî konsertê fîlmê bi nave "Press" ê derhêner Sedat Yilmaz hate pêşkêşkirin. Li gor ku serpereştiyarê festîvalê Sertaç Çetiner da diyarkirin, armanca festîvalê ne xelat in, lê ermanc ew e ku şaristanî, çand û hûnera kurdî hem ji bo Kurdên Ewropayê û hem jî bo neteweyên din yên ewropî werin pêşkêş kirin. Herwiha ji bo ku gav bi gav sînemeya kurdî bibe sînemayeke cîhanî.

Derhêner Azîz Çapkurt yê ku bi 2 fîlman ("Dayîka Min Aşîtiyê Dixwaze" û "Bêdengî") di festîvalê de beşdar bû û ji bakurê Kurdistanê hatibû, kêfxweşiya xwe li Ewropayê têne lidarxistin ji bo hûnermendên kurd şahiyeke mezin e, ji ber ku bi rêya van festîvalan berhemên me digihin gel. Ji aliyekî din ve jî derhêner Azîz Çapkurt xemgîniya xwe anî ziman û got ku "Festîvala sînemayê karekî gelekî giran e. Heta mirov bikaribe bi karên wiha rabe divê dewletek li pişta mirov hebe, lê yê me Kurdan ne dewlet û ne ti kes li pişta me tune ye, ji ber vê yekê jî ew kesên ku kedê didin van festîvalan û birêvedibin ez sipasiya xwe ji wan re pêşkêş dikim."

Birêvebirê sînemayê yê bi navê Klaus Peter Rot jî derbarê vê festîvalê de ji Rûdaw re got "Ji me re tiştekî gelekî balkêş bû ku fîlmên kurdî di sînemaya xwe de pêşkêş bikin. Hinek fîlm hebûn me nas dikirin, mîna fîlmê "Min Dît" û "Kick off Kerkuk" lê fîlmên din tev nû bûn û bala me kişandin. Ji ber ku fîlmên kurdî xwedî taybetmendiyekê ne, ew jî ku ne tenê çand û êşa welatekî tîne ziman, lê belê êşa çar parçeyan pêşkêş dike. Wek mînak fîlmê "Whisper with wind" ê ku wêneyên pir bi hêz pêşkêş dike û fîlmên derhêner Hinêr Selîm tîne bîra me, cuda ye ji fîlmên Kurdistana Tirkiyeyê û yên Kurdistana Îranê. Herwiha ji me re wî şêweyê sînemayê pêşkêş dike, yê ku em dixwazin nîşan bidin, ew jî şêweyê sînemaya cîhanî ye."

Bi tohmeta qaçaxçîkirina bi mirovan Belçîka 8 Kurd girtin

Belçîka (Rûdaw) - Polîsên paytextê Belçîka Brûkselê heftiya borî ragihandin ku wan 8 Kurdên "Îraqî û Îranî" binçavkirine. Ev Kurd bi tohmeta "qaçaxçîkirina bi mirovan" hatine binçavkirin. Polîsên Brûkselê di daxuyaniya xwe de amaje didin wê yekê ku li gor lêkolînên fermî "karê kesên binçavkirî veguhestina koçberên neyasayî bû ji Belçîka bo Brîtanya û welatên Îskandînavyayê." Polîsê navborî dibêje "kesên binçavkirî çalakiyên xwe bi rêya otomobîlên barhelgir (LKW) encam dane û li parkên ser rêyên sereke yên navbera Belçîka û Brîtanya karê xwe dikirin." Herwiha dibêje: "Van kesan di meseleya bikaranîna tundûtijiyê himber mirovên koçber û dijî hevrikên xwe yên din dudilî nekirine."

Polîsên belçîkî herçend navên kesên binçavkirî eşkere nekirine, lê amaje bi wê yekê didin ku wan 8 kesên Kurd retkirine ku ti têkiliyeke wan bi qaçaxçîtîkirinê hebe û ew vê yekê weke tohmet dijî xwe dizanin.

Binçavkirina van 8 Kurdan di demekê de tê ku berî du heftiyan rûniştineke dadgehkirina 18 Kurdên din ên tawanbar bi qaçaxçîtîkirinê li Belçîka hat hilweşandin. Ev jî piştî ku zêrevanên wê zîndana ku Kurdên binçavkirî tê de bûn, bi mebesta baştirkirina rewşa jiyana xwe ketin grevê. Ev jî bo sedem ku anîna wan 18 Kurdan bo ber sînga dadwer pêkneyê. Herçende dadwer amadeyîya xwe nîşandabû ku bêyî amadebûna binçavkiriyan rûniştina dadgehê destpêbike, lê parêzerên Kurdan ev daxwazî retkirin û pêdagîrî li ser wê yekê kirin ku divê ew 18 Kurd jî amadeyî rûniştinê bin. Polîsê belçîkî ji dereng mayîna proseya dadgehkirinê nîgeran e, ji ber ku ihtîmala wê yekê heye ku hinek ji wan kesên girtî li gor yasayê bên azadkirin. Ev jî ji ber ku demeke dirêj di zîndanê de hîştine bêyî ku bên dadgehî kirin. Daxwazkarê Giştî yê Belçîkayê daxwaza cezayê zîndankirina navbera 3 mehan heta 8 salan kiriye bo wan Kurdên binçavkirî.

www.ronakurd.org

Li Almanyayê mafê perwerdeya kurdî heye, lê sûdwergirtin lawaz e

» Vê gavê li dibistanên çar eyaletên Almanyayê mafê perwerdeya bi zimanê kurdî heye

Mamoste Ulumaskan li Senden a nêzîka Munsterê bi şagirtên xwe re

» Mamoste Ozmen: Perwerde tenê bi kurmancî heye, bi zazakî û soranî tune ye

» Mamoste Ulumaskan: Li Bielefeld û Gronau li mamosteyên kurd digerin.

» Mamoste Aydin: Hejmara zarokên kurd kêm bû, beşa kurdî hat rawestandin.

Azad Dîcle

Li Almanyayê ji Cotmehê pê ve li bajarê Munsterê jî bo zarokan perwerda kurdî tê dayîn. Li gor daxuyaniyên Yekîtiya Mamosteyên Kurd (YMK) niha li çar eyaletên Almanyayê bo zarokan perwerda kurdî tê dayîn û hejmara hemû zarokan jî nêzikê 1200 kes in. Lê li hinek herêman ji ber ku malbat zarokên xwe naşînin perwerda kurdî, ders tên girtin û di şûna wan de zarok diçin beşa tirkî.

Di 10ê Cotmehê de li nêzîkî bajarê Almanya Munsterê li bajarokê Sendenê li dibistana seretayî de 16 zarokên kurd dest bi perwerda kurdî kirin. Mamosteyê zarokan Abdulkadir Ulumaskan ji Rûdawê re ragehand ku perwerde encama xebata du malbatan e û got, "Bi giştî 16 zarok hene ku malbatên wan dixwazin perdwerda bi kurdî bibînin. Hemû zarok jî yên du malbatên ji deverâ Mêrdînê ne û me roja sêşemê di dersa yekemîn de hevdu naskir." Ulumaskan da zanîn ku wî li gor temenê wan, zarok li ser du grûpan dabeş kiriye û got ku wê hefteyê 9 saetan dersa kurdî bide zarokan.

"Li Bielefeld û Munsterê li mamosteyan digerin"

Mamoste Abdulkadir Ulumaskan li bakurê Kurdistanê jî mamostetî kiriye, endamê Yekîtiya Mamosteyên Kurd e û li Almanyayê 7 sal in ku li dibistanên corbecor perwerdeya bi kurdî dide. Li gor agahiyên ku Ulumaskan dane Rûdawê, li bajarên Bielefeld û Gronau ya ser bi Munsterê jî bo perwerda kurdî hewldanên malbatan heye û li van deran malbat û rêveberiya dibistanan li mamosteyan digerin, lê Ulumaskan got, "Mixabin kesên ku xwediyê krîterên mamosteyan in, zêde tune ne. Divê ew kes baş bi almanî zanibe û dîploma wî hebe." Di dawiya axaftina xwe de Ulumaskan bir bîr xist ku li bajarê Wesel û Dinslakenê jî ji bo mehane 28 saetên pêdivî bi mamosteyekî heye.

"Li çar eyaletan perdwerdeya kurdî heye"

Endamê Rêveberiya Yekîtiya Mamosteyên Kurd, Fevzî Ozmen jî derbarê destpêkirina perwerdeya kurdî li Almanyayê got, "Ji bo gelên bê dewlet, wek Kurd û Romanan, di zagonên welatên Ewropayê de, nemaze di zagonên Almanyayê de mafê perwerdeya bi zimanî zikmakî bo zarokan heye. Hewldanên Kurdên li Almanyayê di salên 90î de dest pê kirin. Niha li çar eyaletan, ango li eyaleta Nordrhein-Westfalen, Niedersachsen, Bremen û Hamburgê li çendîn dibistanên seretayî perwerdeya kurdi tê dayîn. Lê hêjmar gelek kêm e û helwesta malbatan jî ne baş e." Ozmen destnîşan kir ku li hinek deveran ji ber ku malbatan zarok neşandine, perwerdeya kurdî rawestiyaye û ew maf ji dest çûye.

"Ne bi dilê min be jî, lê ez neçar mam ku perwerdeya bi tirkî dom bikim. Ji ber carnan ez diçûm min didît ku sinif vala ye"

Ozmen da zanîn ku hewldanên malbatên kurd ji bo perwerdeya kurdî tenê ji bo zaravayê kurmancî tên dayîn û got, "Ne ji bo zazakî û ne jî ji bo soranî hewldan tune û di van zaravayan de li ti dibistanekî perwerde nayê dayîn."

Niha perwerdeya tirkî dide

Mamoste Mahmut li Îzmîrê dest bi mamostetî kiriye û piştî ku hatiye Almanyayê jî ev 7 sal in bi kurdî û tirkî di çendîn dibistanan de dersan dide. Mamoste Mahmut ji sala 1998ê pê ve li bajarên wek Dortmund, Bochum û Weselê perwerdeya kurdî daye û di vê navberê de li hinek deveran jî perwerdeya bi tirkî daye. Aydin da zanîn ku ev çend sal in li Dortmund û Bochumê di dibistanan de perwerdeya bi kurdî nemaye û wiha axivî: "Mixabin di vir de hemû bar dikeve ser pişta malbatan. Lê dema ku malbat zarokên xwe neşînin, perwerde jî radiweste." Mamoste Mahmut daxuyand ku ji bo li dibistanekî beşa kurdî bê vekirin, pêdivî bi kêmahî 16 zarokan heye û got, "Dema ku ev hejmar kêm bibe rayedarên dibistanê demekê çavê xwe digirin, lê dema ku kêmbûnê dom kir û sinif vala bibin, perwerde radiweste." Mamoste Aydin di helwesta malbatên kurd de sarbûnekê dibîne û dibêje, "Ne bi dilê min be jî, lê ez neçar mam ku perwerdeya bi tirkî dom bikim. Ji ber carnan ez diçûm min didît ku sinif vala ye, demekê min zarokên xwe jî dibir ku hejmar zêde bibe, lê li Dortmundê ji sala 2005ê pê ve mafê perwerdeya kurdî nema."

Şertên ji bo wergirtina mamosteyên zimanê kurdî

Dibistanên almanî bi kurtasî bi van şertên jêr kesekî weke hîndekarê zimanê kurdî qebûl dikin û werdigirin:

1) *Divê kesê serlêdêr beşa pedagojî/mamostetî li Almanyayê xilas kiribe û herwiha xwedî dîplomayek zimanê kurdî be (Kompetenzstufe C 1 für Kurdisch).*

2) *Kesê ku li derveyî Almanyayê pedagojî/mamostetî xilas kiribe û xwedî dîplomaya zimanê kurdî be, dikare serî li dibistanan bide. Lê kesê ku li derveyî Almanyayê xwendibe, divê tevlî ezmûneke zimanê kurdî bibe.*

3) *Kesên ku ji derveyî Almanyayê bixwazin weke mamosteyên zimanê kurdî bên wergirtin, divê xwedî xwendina pedagojî/mamostetî bin, herwiha xwedî dîplomaya zimanê kurdî û herwiha xwedî dîplomaya zimanê almanî, bo mînak dîplomaya zimanê almanî ya enstîtuyên Goethe.*

Parêzer Uzun
Buroya Parêzeriyê
Em li seranserê Almanyayê di xizmeta we de ne
Parêzer Oktay Uzun
Reklam
Beşên me yên kar
Dadweriya Kar (Arbeitsrecht)
Dadweriya Aborî (Wirtschaftrecht)
Dadweriya Trafîkê (Verkehrsrecht)
Dadweriya Werzîşê (Sportrecht)
Dadweriya Peymanê (Vertragsrecht)
Dadweriya berpirsiyariya pizîşkî (Arzthaftungsrecht)
Navnîşan:
Sonnemannstr. 3
60314 Frankfurt am Main
Tel.: 069 – 49 600 87
Fax: 069 – 49 600 88
email: info@kanzlei-uzun.de
web: www.kanzlei-uzun.de

www.arsivakurd.org

Diyarbakirspor a Nû bû lîder

Amed (Rûdaw)- Li Amedê bi navê Diyarbakirsporê du tîmên futbolê hene: Diyarbakırspor û Yeni Diyarbakırspor, ango Diyarbakirspor a Nû.

Diyarbakirspor a Nû di lîga amatoran de cih digire û hewl dide ku di dawiya vê sezonê de derbasî lîga 3.mîn bibe. Serokê Klûbê Bedirhan Akyol ragihand ku her diçe xelk wan nas dike û piştgirî dide wan û got, “Di maça me ya ligel Mûş Muratsporê de me piştgiriya alîgirîn xwe dît.“

Maça dawiya hefta borî di navbera Diyarbakirspor a Nû û Mûş Muratsporê de li Amedê hat leyîstin û Diyarbakirspor a Nû 3-1 bi ser ket û lîdertiya xwe xurt kir. Diyarbakirspor a Nû her sê maçên din jî standibû û tevî maça dawiyê pûanên xwe kirin 12.

Serokê Klûbê Bedirhan Akyol di dawiya maçê de ragihand ku ew hewl didin bi piştgiriya alîgirên xwe tevlî lîga 3’mîn bibin.

Li Swêdê sezon bi dawî bû, Dalkurd li cihê xwe ma

“Armanca me ya dawî Lîga Alsvenskan û UEFA ye“

- Dalkurd bi kêmaniya 1 pûan mafê Play-Offê winda kir.
- Kizil: Me gelek maçan di deqeyên dawî de winda kir.
- Gelê me piştgiriya me bike, em ê bigîhin armanca xwe ya mezin.

Hêviya Dalkurdê ya beşdariya lîga Superetten ma heta sezoneke din...

Hefta borî li Swêdê sezona lîgên futbolê bi dawî bû û tîmên ku lîg guhertin, tîmên ku daketin û tîmên ku di cihê xwe de man hemû diyar bûn. Tîma kurdan ya ku di Lîga Bakur (Norra) de dileyîst Dalkurd, ji ber kêmaniya pûanek nekarî derbasî lîga jor Superetten bibe û hêviya Dalkurdê ma bo sezona dahatû. Serokê Klûba Dalkurdê Ramazan Kizil bi dengekî xemgînî ragihand ku meşa wan didome û heta ew bigîhin armanca xwe ya herî mezin wê hewl bidin her tişt bikin. Armanca Kizil û ya Dalkurdê jî ev e: Cîhgirtin di lîga Alsvenskan de û beşdariya Lîga UEFAyê.

Tîma kurdên li Swêdê Dalkurdê sezona 2011ê bi 49 pûanan sezonê qedand û derfeta derbasbûna lîga jor, ya Superrettenê winda kir. Umea ligel 51 pûan bû şampiyonê lîga Norra yê vê sezonê. Tîma duyem Vasby ligel 50 pûanan wê Play-Offê bileyîze; Siriusa ku 50 pûanên wê hene û Dalkurda xwedî 49 pûanan wê di lîgê de berdewam bikin.

Serokê Klûba Dalkurdê Ramazan Kizil ragihand ew ji encamê xengîn in û got, “Lê em klûbeke nû ne, derfetên me gelek kêm in û derfetên tîmên din gelek zêde ne. Meşa me wê bidome û em ê ji bo sezona nû çendîn guhertinan çêkin. Ji jêrxaneya Dalkurdê em ê 4-5 xortan tevlî tîmê bikin, û em ê hinek leystikvanên biyanî ku zêde berpirsyarî nîşan nedan, ji nava xwe derxînin.“

“Me di deqeyên dawî de maç winda kirin“

Ramazan Kizil got eger wan çend maçên dawî yên ligel tîmên qels bidestxistbana, wê sedî sed bibûna şampiyon û got ku di gelek maçan de Dalkurdê serkeftî destpê kiriye lê di deqeyên dawî de sist bûne û gol xwarine. Kizil got, “Eger me di maça ligel Frej de di 15 saniyeyên dawî de gol nexwara û Syrianska ya ku em têk 4-2 birin, ligel dijberekî me winda nekira wê encam ne weke îro bûya. Li gel Akropolisê jî heta deqeya 60’min em 3-0 li pêş bûn, lê leystikvanên me xwe sist kirin û maç 3-3 bi dawî bû û me pûan winda kirin.“

Kizil bi bîr xist ku hê saheya wan tuneye û tenê ji bo kirêya saheyê salê 50 hezar euro pere didin. Wek ku Kizil got butçeya Dalkurdê salane 300 hezar euro ye, lê ya tîmeke weke Umea salane 1 milyon û 800 hezar euro ye. Kizil got ew amadekariyên xwe ji bo serkeftineke demdirêj dikin û bang li sazî û karsazên kurd kir ku xwedî lki wan derkevin. Kizil wiha axivî: “Vê sezonê jî em derbasî lîga jor nebûn, lê em armanca xwe diparêzin, armanca me cîhgirtina di Lîga Alsvenskan de û wek yekem tîma kurd beşdariya Lîga UEFA ye.“

Tîm		M	S	W	T	G	P					
1.	Umeå	26	15	6	5	43:27	51	S	S	S	S	S
2.	Vasby	26	15	5	6	51:26	50	S	S	N	N	S
3.	Sirius	26	14	8	4	44:20	50	S	S	S	S	S
4.	Dalkurd	26	14	7	5	51:35	49	S	S	N	U	U
5.	Forward	26	9	11	6	45:37	38	N	S	N	N	N
6.	Vasalund/Essinge	26	9	10	7	44:36	37	U	N	N	N	S
7.	Karlstad	26	9	6	11	36:39	33	N	N	S	S	N
8.	IK Frej	26	8	8	10	36:29	32	U	N	S	U	N
9.	S. Kerbura	26	9	5	12	35:51	32	N	S	N	N	N
10.	IFK Lulea	26	7	9	10	26:38	30	N	N	S	N	S
11.	Akropolis	26	7	8	11	32:36	29	N	N	S	S	U
12.	V. Syrianska	26	8	4	14	37:47	28	S	N	S	S	N
13.	Bodens	26	4	8	14	29:54	20	N	N	N	S	N
14.	Hammarby TFF	26	5	3	18	27:61	18	S	S	N	N	S

M Maç, **S** Serkeftin, **W** Wekhevî, **T** Têkçûn, G Gol, **P** Puan

www.diwarkurd.org

Mîr Qasimlo

Navê film "Çerx" e. Mijara wî ya sereke, tolhilanîna jineke kurd e ku nagihîje mirazê xwe û tê kuştin. Piştî tê kuştin, bi giyanî li jiyanê vedigere û tola xwe ji bav û bira û hezkirinê xwe distîne. Zimanê film bi kurdî û almanî ye û Chepo Gewez hem derhêner e, hem senaryo nivîsandiye û hem jî di film de dileyîze. Gewez fîlmê xwe weke yekem fîlmê kurdî yê erotîk, lê weke fîlmekî tirsxofê binav dike û bi ser de jî dibêje, "Di fîlm de hinek sahneyên erotîk jî hene." Di fîlmê Çerx de du karakterên sereke yên jin hene, lê leystikvan ne Kurd in. Film havîna îsal, li bajarê Freiburg a Almanyayê hatiye kişandin û wek ku derhêner ragehand fîlm di meha Mijdarê de wê di çerçoveya Festîvala Fîlmên Kurdî ya Berlînê de were ravîdan. Nivîskarê kurd Mîr Qasimlo, Rindo Sur, Lena Nowak û Maria Ro di fîlm de dileyîzin; yek ji leystikvanan, nivîskar Mîr Qasimlo dibêje, "Rolekî min a ku hemû sahneyên filmê dagir bike, tune ye. Dilê min tune bû ez bileyîstama lê ji ber dostaniyeke dirêj ya min û derhêner hebû, min daxwaza wî neşikand û ez di du sahneyan de leyîstim."
Li gor dîtina Mîr Qasimlo ev fîlm ji aliyê bêtirsî, bezandina sînorên civakî yên tên zanîn û ji aliyê wênekirina hezkirin û kîna di mirov de heye û bêguman bicihdana sahneyên seksê, ji fîlmên din cudatir e û xwediyê nasnameyeke taybet e. Qasimlo derbarê nasnameya film de berovajî derhêner difikire: "Erê mirov dikare bêje ku ew yekem fîlmê kurd yê erotîk e, ligel hêlên din wek tirs û xof û destnîşankirina kuştina jinan ya ji ber namûsê."

Derhênerê fîlm dibêje me karê temaşevanan zehmet kiriye

Çerx fîlmekî horror e yan erotîk e?

Me derbarê mijar, kişandin û dahatûya fîlmê bi navê Çerx de, bi derhênerê film Chepo Gewez re hevpeyvînek çêkir.

We çawa dest bi nivîsandin û kişandine filmek wiha kir?

Ez ji sînemayê pir hez dikim, ez wekî din ji wênekişandinê û vegotina çîrokan hez dikim. Lewma min pir çîrok û pexşan bi almanî, herwiha bi kurdî nivîsandin. Rojek min ji xwe re got ka ez çima ji hemû cîrokên ku min nivîsandine, fîlmekî kurt an metrajdirêj Wiha min dest bi vê projeyê kir.

Ango tiştek bi we re hebû ku we dixwest bi zimanê sînemayê vebêjin...

Belê; biryara li ser vegotina bi amarên sînemayê, ango vegotina bi dîmenan li cihekî din ji bo min bû wek gerîna zimanê zikmakî. Min hertim digot ku tişteke min heye divê ez vebêjim, lê min nizanîbû ka ez van tiştan çawa vebêjim. Ev yek gelek ciwanên kurd ji xwe dipirsin, gelek ji wan xwediyê heman pirsgirêkê ne. Bi hemûyan re çîrok û serpêhatiyên balkês hene, di jiyana hemûyan de trajedî û windakirin hene, gelek ji wan xemgîn in, lê nizanin ka van serpêhatiyan çawa pêşkêş bikin.

We çawa vê hêzê bi xwe re dît ku hûn dest bi projeya film bikin?

Bi xêr û hilbijartina ziman re min ev hêz di xwe de dît. Dema ku mirov ligel serpêhatiyekê, zimanekî rasteqîn hilbijêre ev kar digîhe endama xwe; lê ji ber ku gelek kes ji bo berhema xwe ya hunerî ew zimanê rasteqîn nabînin, nikarin gav bavêjin, di nava fikir, raman û xeyalan de dimînin û paş ve diçin. Divê serpêhati têkeve nava peyvan, ji wir jî derbasî wêneyan û dimenan bibe. Ev e yekem rêçika rast ya ku pêdiviya me pê heye.

Em werin ser mijara nasnameya film. Çerx çi ye û behsa çi dike?

Beriya her tiştî dixwazim bêjim ku ez pir ji fîlmên horror ango fîlmên bi tirs hezdikim; min hertim xeyal kiriye ku rojekê ez fîlmekî wiha bikişînim. Yekemîn gava min ew bû ku min çîrokek ji bo film dît. Min di nava gelek mijaran de lêkolîn kir, ez li mijarek hem aktuel û hem jî potansiyel digeriyam. Min mijarê dît: Tûndiya li dijî jinan û xwekuştin an jî kuştina jinan.

Baş e, mijara ku e ji bo film hilbijart, ji bûyerên rastîn tê, an fiktion e?

Wisa xuya dike ku ku mijar hemû rastîn e. Jiber ku tûndiya li dijî jinan niha fenomeneke rojane ye. Paşê min mijara film, ango çîroka film bi mantiqeke trajîk xemiland, lê zêde kirin, û di dawiyê de wisa tiştek jê derket ku ne diyer e gelo ka çîrok rastîn e an fiktion e. Ango min ev herdu tistan bi zanatî tevlî hev kirin.

Ji bilî nivîsandina çîrokê we çi kir?

Min senaryo nivîsand, derhêneriya film kir û ez tê de leyîstim jî.

Weke em jê agahdar bûne, Çerx yekem fîlmê erotîk yê bi kurdî ye, lê hûn behsa horrorê dikin...

Naxêr, Çerx ne yekem fîlmê kurdî yê erotîk e, fîlmekî horror e lê te de hinek sahneyên erotîk hene. Mirov dikare bêje ku yekem fîlmê kurdî ye ku tê de wiha sahneyên erotik hene.

Ti kes an jî ti saziyek pistgirî dane we di aliyê aborî de? Ango sponsor û produktorê film kî ne?

Ligel ku em di nava karsazên kurd de pir li sponsor û alîkariyê geriyan, lê mixabin ti kesî alîkarî neda me. Tişta ku me dît bêbaweriyeke mezin hebû ji bo me û ji bo hunerê. Tenê birayê min û hevalekî min alîkariyeke biçûk dane me. Tenê ew herdu prodokturên me ne.

Di film de du karakterên jin hene, lê ne jinên kurd in. Gelo we jinên kurd ji bo filmê xwe nedît an hûn li wan negeriyan?

Min pir dixwest ku ez di vê projeyê de jin û keçên kurd bibînim. Lê mixabin me nekarî. Yên ku min daxwaz ji wan kir, nekarîbûn bi serê xwe biryarê bidin, min jî nexwest ku malbatên wan ji wan re pirsgirêkan derxînin, lewma min zêde israr nekir. Di dawî de me du jinên ne kurd dîtin.

Niha film di kîjan astê de ye? Em ê kengê karibin temaşe bikin?

Fîlm bi giştî qediya, û wê di demeke nêzîk de li Berlînê wê tevlî Ferstîvala Fîlmên Kurdî bibe. Ez nizanim ka wê temaşevan fîlmê min çawa bibînin û binirxînin. Me karê temaşevanan jî zehmet kiriye, ji ber ku em çendîn dîmenên bi cesaret nîşanê wan didin û wan rastî surprîzekê tînin. Ez ji niha de bi heyecan im.

Hevpeyvîn: Mehmet Sebatli

Rindo Sur û Maria Ro rolên sereke dieyîzin.

Biyografî

Chepo Gewez ji Vartoya ser bi Mûşê ye, li Zanîngeha Înonu, li Meletiyê beşa psîkolojiyê û li Almanya jî beşa felsefê xwendiye. Gewez heta niha 3 kurtefîlman kişandine û Çerx filmê wî yê yekem metrajdirêj e.

www.arsivakurd.org

Serokê Dîwana Serokatiya Herêma Kurdistanê, Dr. Fuad Hisên:

Piştgiriya Kurdên li Sûriyê em weke erkê xwe dibînîn

» Hikûmeta Herêma Kurdistanê di nav hewldanên çareserkirina pirsgirêka PKK-Tirkiyeyê de ye

Dr. Fuad Hisên, weke Serokê Dîwana Serokatiya Herêma Kurdistanê, rojane ligel pirsgirêk û pirsên siyasî, îdarî û dîplomasi yên têkilî Kurdistanê dijî. Rûdawê derbarê gelek pirsên ku Kurdan ji nêz ve eleqedar dikin, li nerînên Dr. Fuad Hisên pirsî.

Hûn hatibûn destnîşankirin ku amadekariyên Kongreya Netewî bikin, weke Serokê Lîjneya Amadekariyê. Gelo ti amadekarî hatine kirin?

Ev kongre ji ber şer û topbaranên ku vê dawiyê çêbûne hat paşdexistin. Kongre ji bo wê yekê ye ku peyama aşîtiyê bide hundir û derveyî Kurdistanê, lê dema şer dest pê kir pêwîst bû kongre bê paşdexistin. Rast e, hin amadekarî hatibûn kirin, me fikra danîna komîteyekê kiribû bo rêvebirinê û heta behsa dema wê jî hatibû kirin.

Hemû alî wê beşdarî wê kongreyê bibin?

Ev jî yek ji pirsyaran bû. Me komeke pirs pêşkêş kirin, a yekedûrî van bûyeran in û gav bi gav dûvçûna wan dikin.

Lê heta niha jî partiyên kurdî li Sûriyê ji hev dûrin.

Nexêr, ne wisa ye. Bûyer îsbat dikin û di van nêzîkan de jî wê diyar bibe. Rast e, li Sûriyê partiyên kurdî gelek in, lê sîwaneke wan jî heye û bêtirî 10 partiyan di bin wê de civiyane û ewê di van nêzîkan de kongreya xwe saz bikin.

Li Hewlêrê?

Li kû derê be ne girîng e, lê di van nêzîkan de wê kongre bê sazkirin.

Bi goşara Herêma Kurdistanê?

Em goşarê naxin, em di warê lihevguhertina bîrûbaweriyan de bi wan re ne. Em weke Kurd erkê xwe dibînin ku bi wan re bin û piştevaniya wan bikin. Me heta behsa wê yekê jî kiriye ku ew şaşiyên me pêkanîne ew di siberojê de dubare nebin. Ew jî bi ciddî rewşa xwe lêkolîn dikin û stratejîka xwe diyar kirine. Ew meseleyên taktîkî yên rojane lêkolîn dikin. Bi qasî ku ez haydar im, hemû alî jî ji helwest û tevgera Kurdan razî ne, mebesta min li ser asta herêmî û navnetewî. Hel-

Serokê Sûriyê nameyeke vexwendinê bo Serok Barzanî şand ku serdana Sûriyê bike, lê ew neçû

mîn kî beşdar bibe û çawa beşdar bibe. Eger ji hemû beşên Kurdistanê bin, li ser bingeha partîtiyê be, çawa û ev hemû partî wê çawa beşdar bin? Yan eger li ser bingeha kesayetiyan be, kî beşdar dibin? Derbarê van hemû tiştan lêkolîn û axaftin hatine kirin.

Kurd û Sûriye

Hemû dinya konkujiyên ku li Sûriyê pêk tên protesto dikin, lê Herêma Kurdistanê bê deng e, çima?

Me weke hevwelatî û weke Herêma Kurdistanê, û weke serkirdayetiya siyasî jî, piştevaniya mafên gelê kurd kiriye li her cihekî û bi taybet di vê demê de li Sûriyê. Ez dixwazim wê yekê jî eşkere bikin ku Herêma Kurdistanê roleke sereke lîstiye di warê lihevguhertina bîrûbawerî, rûniştin û gotûbêjên ligel serkirdeyên siyasî yên Kurdên Sûriyê. Em ne

bet giraniya Kurdan li Sûriyê xuya bû û rola Kurdan jî li Sûriyê li ber çavan tê girtin, lê dîsan jî yekrêziya Kurdan li Sûriyê gelekî girîng e û çiqas xurttir be, wê destketiyên baştir bi dest bixin.

Serokê Dîwana Serokatiya Herêma Kurdistanê, Dr. Fûad Hisên

Wêne: Rûdaw

Desthilatdarên Sûriyê Serokê Herêma Kurdistanê weke Serokê Herêma Kurdistanê nasnekiribûn û her vexwendina ku wan şandibe jî weke Serokê PDKê jê re şandine. Lê vê dawiyê wan ew weke Serokê Herêma Kurdistanê vexwendibû. Gelo bersiva wî çi bû?

Rast e, vexwendin hatibû, lê wî serdana wan nekir. Niha ne rewşa Sûriyê û ne ya navçeyê ji bo serdanê bikêrhatî ye.

Berê jî, dema Wezîrê Derve yê Sûriyê serdana Bexdayê kir, wî xwestibû ku hevdîtinê ligel Serokê Herêma Kurdistanê bike, lê daxwaza wî nehat qebûl kirin.

Haya min ji vê tune, lê ez dizanim ku ew weke Serokê Herêma Kurdistanê ji aliyê Serokê Sûriyê hatibû vexwendin.

Tirkiye û Herêma Kurdistanê û pirsgirêka kurd

Kengî?

Berî çend mehan, wê demê destpêka bûyerên Sûriyê bû, lê me got niha rewş ne kêrhatî ye.

Ev demeke rewşa Tirkiyeyê berbi aloziyên bêtir diçe. Wê çi bandora vê li ser têkiliyên navbera Tirkiyeyê û Herêma Kurdistanê hebe?

Em dikarin rewşa Tirkiyeyê ji du aliyan bibînin. Hûn vî alî dibînin, lê aliyê din ewe ku nûnerên kurd li parlemenê gotûbêjan dikin, rûdinin û civînên nehênî û eşkere hebûn û hene. Derbarê têkiliyên me, ez bawerim niha boçûneke stratejîk çêbûye, hem li vir û hem li Tirkiyeyê jî. Ev ne tenê ji bo Tirkiyeyê ye, lê bo me jî girîng e ku têkiliyên me yên ji vî rengî ligel cîranan hebin, bi taybetî ligel Îran û Tirkiyeyê. Derbarê Tirkiyeyê jî, mesele ne girêdayî pirsgirêkeke ewlehiyê li ser sînoran e, lê boçûneke bo siberojê û berjewendiyên aborî, kulturî û dîrokî. Loma tevlî hemû tiştan jî, têkiliyên me û Tirkiyeyê her berbi pêşve diçin.

Herêma Kurdistanê dikarî pirsgirêkê ligel Îranê çareser bike û PJAKê ji ser sînoran bikşîne. Çima ligel Tirkiyeyê jî derbarê PKKê de heman tiştî nake?

Ligel Tirkiyeyê jî bi heman şêweyê û ji vê bêtir jî hewldan hene.

Rola Herêma Kurdistanê çi bû di wan gotûbêjan ku li cihên cuda pêkhatibûn? Gelo herdu alî gihabûn çi astê?

Rola Herêma Kurdistanê û rola Serokê Herêma Kurdistanê piştevanîkirina wê proseya siyasî ye. Bi her awayekî be divê ev pêvajo raneweste û bidome. Eger demekê li cihekî rawestiya jî, divê rasterast li ciyekî din deriyek bê vekirin, jib o ku berdewam be.

Piştî bûyera Çelê û kuştina 24 leşkerên tirk di êrîşeke PKKê de, hûn bi nûnertiya Serokê Herêma Kurdistanê, ligel Nêçîrvan Barzanî, çûn Tirkiyeyê. Hûn ligel Serokwezîr û Wezîrê Derve yê Tirkiyeyê ji bo aramkirina rewşê civiyan. Gelo encamên vê serdana we çi bûn?

Rast e, em piştî wê pirsgirêka ser sînor çûn Tirkiyeyê, lê têkiliyên navbera Herêma Kurdistan û Tirkiyeyê ji bûyerekê firehtir in. Em berê xwe didin siberoj û stratejiyekê, lê tevlî vê yekê jî ev pirsgirêk bi vî şêweyî nayên çareserkirin. Li Tirkiyeyê niha rê û rêbazek dest pê kiriye ku siyasî ye û em jî piştevaniya wê rêbaza siyasî dikin. Ev rê û rêbaz di hemû civîn û rûnişti-

Leşkerên Îraqê bo ser sînorên Herêma Kurdistanê û Tirkiye/Îranê tên şandin?

Rûdaw: Derbarê wan guftûgoyên derbarê şandina leşkerên Îraqê bo ser sînorên Herêma Kurdistanê û Îran û Tirkiyeyê hûn çi dibejin?

Ev babet di civîna Stenbolê de hat behskirin ku civîneke berdewam a navbera Îraq û Tirkiyeyê de ye û derbarê mijarên stratejîk de bi serperiştiya Wezîrê Derve yê Îraqê hat sazkirin. Wezîrê Derve û Serokwezîr jî di vê çarçoveyê de behsa wê yekê kirin ku pêwîste sînor di destê dewleta Îraqê de be. Bi baweriya min ev bêtirî ku li dijî Herêma Kurdistanê be, peyameke ji bo Îran û Tirkiyeyê.

Parlementerê kurd li Bexdayê, Mehmûd Osman dibêje Îraniyan li Bexdayê pêdagirî li ser wê yekê kirine ku hêza ji bo parastina sînoran re bê şandin divê leşkerê Îraqê be. Ev rast e?

Ez nizanim Dr. Mehmûd Osman li kû ew behs kiriye, lê ez dizanim dema ku şanda me çû Tehranê, Îraniyan bi şêweyekî eşkere gotin ku ew razî ne hêzên girêdayî Herêma Kurdistanê biçin wan cihên PJAK û PKKê. Jixwe ev sînorên Herêma Kurdistanê ne û her divê em beşek bin ji parastina wan. Lê li gor destûrê ev sînor beşekin ji sînorên navnetewî yên Îraqê jî.

Tirkiye jî qebûl dike ku hêzên Pêşmerge li ser sînoran bin?

Ez bawerim Tirkiye jî qebûl dike. Ji Bexdayê ti hêz nayên, ev behs tên kirin, lê waqîi tiştekî din e. Eger hêzek biçe ser sînoran, wê hêza hundirê Herêma Kurdistanê be. Ez ji aliyê praktîkî behs dikim, lê ji aliyê destûrî mesela sînoran mafê hikûmeta federale.

Wezîrê Derve yê berê yê Brîtanya, David Miliband:

Eger hûn biçin Hewlêrê hûnê civakeke medenî û geşbûyî bibînin

Roj Ehmed Brîtanya

» David Miliband bo Rûdawê: Hikûmeta Herêma Kurdistanê û PKK ji hev cuda ne, Tirkiye jî di warê girtina rojnamevanan de weke Çînê ye.

Wêne: Rûdaw
Wezîrê Derve yê berê yê Brîtanya, David Miliband

Wezîrê Derve yê berê yê Brîtanya David Miliband roja 20ê Cotmeha 2011ê di semînereke xwe de li Zanîngeha Leeds Metropolitan li bakûrê Îngilîstanê, ku tê de Rûdaw jî amade bû, çendîn pirsên siyasî yên navnetewî şîrove kirin. Aliyekî semînarê jî derbarê Kurdistanê de bû.

Mijar gelek bûn û di dema yek demjimêrê de daxuyanî û ronkirin ji cenga Lîbya û nûçeya kuştina Qeddafî çûne ser qeyranên aborî yên Brîtanya û greva giştî ya karkerên wî welatî û hêza sosyal-demokratan li Ewropayê û xebata karkerên ewropî himber "çaksaziyên aborî", hikûmetên rastgir ên Ewropayê. Herwiha ji ber ku Miliband bi sedema "Buhara Erebî" serdana navçeyê kiribû, loma di dawiyê de behs hate ser Rojhilata Navîn û şoreşa Misrê, herwiha pirsgirêka kurdî li Îraq û Tirkiyeyê.

David Miliband di bersîva pirsyarekê de got "xweştirîn tiştê ku mirov di nava zanîngehên Brîtanyayê de dibîne û cihê geşbîniyê ye, ew e ku mirov dikare di nava vê salona dersgotinê de gelek tişan gotûbêj bike li ser şertûmercên navnetewî. Fermon, li vir pisporekî me yê Kurdistanê jî heye." Miliband destê xwe nîşanî wî kesê ku pirsyar kirî kir ku xwendekarê Zanîngeha Leeds Metropolitan e û xwe weke Kurdê Herêma Kurdistana Îraqê daye nasandin.

Miliband di bersîva pirsyara wî xwendekarê kurd de behsa wê yekê kir ku wî berê serdana Herêma Kurdistanê kiriye, loma ji amadebûyan re got "hûn eger biçin Hewlêrê, ku ez jî li wir bûm, hûnê civakeke sivîl a geşbûyî bibînin. Herwiha eger em hizra pirsgirêkên navçeyên yên pênc salên berê bikin, em ê bizanin ku ev navçe pêşketiye. Wê demê li ser Kurdistanê goşarên mezin hebûn, lê Tirkiye niha ji gelek aliyan vekirîtir e, herwiha li Îraqê hikûmeteke kurdî heye ku dixwaze pirsgirêkan ligel Tirkiyeyê bi rêya danûstanan çareser bike. Ev xalên gelekî pozîtîv in."

Miliband got ku ew hêvîdar e li navçeyê "destûra demokratîk" cîhê xwe bigre, lê wî bi rêya behskirina "destûrekî demokratîk" jî rexne li rêbaza xebata çekdarî ya Kurdan kir û got "her nearamiyek berevajî destûra demokratîk e, loma divê bên handan ku beşdarî sîstema siyasî bibin, lê ji bo çareserkirina pirsgirêkan dest nedin çekan." Wî herwiha têkiliyên kulturî, perwerdeyî û bazirganî jî ligel Herêma Kurdistanê girîng nirxandin, lê got "tiştê gelekî girîng ewe ku pêkdadan nebin û ez hêvîdarim ku xelkê wir (Kurdistanê) ji şeran bêzar bûbin."

David Miliband di dirêjahiya axaftinên xwe de Tirkiye weke "welatekî vekirî himber demokrasiyê" bi nav kir û got wî di serdana xwe ya vê dawiyê bo Tirkiyeyê pêşketin li wî welatî dîtine û weke mînakeke demokratiya li Rojhilata Navîn behsa Tirkiyeyê dikir.

"Ez hêvîdarim ku xelk li Kurdistanê ji şer bêzarbûbin"

Di bersîva pirsyareke Rûdawê de ku "gelo Tirkiye çiqas dewleteke vekirî û demokratîk e, di demekê de ku serokên şaredariyên bajarên kurdan digire, herwiha şeş parlementerên lîsta kurdî ku bi hilbijartinê de hatin hilbijartin, lê azad nake. Gelo Brîtaniya heta kengî wê Kurdan û rêxistinên siyasî yên kurdan li Tirkiyeye weke "terorist" bide naskirin û gelo dema wê yekê nehatiye ku Brîtanya bi germî parastina Hikûmeta Herêma Kurdistanê bike himber êrîşên niha yên Tirkiyeyê û hatina hêzên wan bo nava xaka Herêma Kurdistanê bi şêweyekî ne yasayî, bi taybetî ku niha Brîtanya bêtirîn bazirganên xwe li navçeyê hene. Miliband di bersîvê de got "ez ji Hikûmeta Herêma Kurdistanê re nabêjim terorist, lê PKKê karên teroristî encam dane û ev tiştekî bêyî gumane. Ev du alî du tiştên ji hev cuda ne. Beşeke wê jî rast e ku Tirkiye ne vekirî ye, bo mînak Tirkiye di warê azadiya bîrûbaweriyan û girtina rojnamevanan de weke Çînê ye, lê min li wir (li Tirkiyê) dengê xwe bilind kiriye derbarê wan pirsgirêkan de û min dijî girtina rojnamevanan jî axaftin kirine."

"Li şûna handanê, divê em Tirkiye bixin ser rêya Yekîtiya Ewropayê"

Paşî Miliband amaje da wê yekê ku ew dixwaze "bi geşbînî bifikire, lê ne bi xemgînî" wî herwiha pêşveçûna demokratiyê û xurtkirina civaka sivîl a Tirkiyeyê jî bi qebûlkirina Tirkiyeyê di nava rêzên Yekîtiya Ewropayê girêda û got "baştirîn çareserî ji bo geşepêdana pozîtîv li Tirkiyeyê ew e ku em wê bixin ser rêya Yekîtiya Ewropayê, li şûna ku em wê hanî derveyî Yekîtiya Ewropayê bidin."

Miliband ev nêzîkî 10 salane li ser lîsteya Partiya Karkeran parlementer e û di nav hikûmeta brîtanî ya bi serokatiya Gordon Brown de ji sala 2007ê heta 2010ê Wezîrê Derve yê Brîtanyayê bû.

---

nan de tê behskirin. Li Tirkiyeyê niha komîteyek ji bo amadekirina destûra nû ava bûye û di wê komîtê de nûnerên kurd jî endam in. Guhertina destûrê Tirkiyeyê pêngaveke girîng e ji bo ku ev rêbaz bicih bibe. Ji bo çareserkirina pirsgirêka kurd li

Me hinek amadekariyên kongreya netewî kiribûn, lê dema şer dest pê kir, kongre hat paşde xistin

Tirkiyeyê ti çareyeke din nîne ji bilî rêya diyalog û danûstanê. Hikûmeta Tirkiyeyê jî niha di vî warî de pêş ketiye. Vêca pêwîste em jî pêre tevbigerin û bi vî şêweyî berbi pêş ve biçin, loma pêwîste kesên çalak û têkildarên meseleya kurd li Tirkiyeyê pêşwaziya vê pêngavan Hikûmeta Tirkiyeyê bikin.

Nêçîrvan Barzanî got ku derbarê gelek tiştan de bi hûrbînî axaftin hat kirin ji bo alîkariya navbera herdu aliyan de. Gelo ev alîkarî çi ne?

Belê rast e, di civînan de behsa gelek xalan hat kirin, behsa wê yekê hat kirin ku têkiliyên navbera Tirkiyeyê û Herêma Kurdistanê firehtir e û ji van pirsgirêkên ku li ser sînoran pêk tên û divê ev pirsgirêkên ser sînor çareser bibin. Ji xwe nabe xaka Herêma Kurdistanê li dijî dewletên cîran bê bikaranîn, ne destûr vî mafî dide me û ne di berjewendiya gelê kurd bi giştî de ye û Herêma Kurdistanê bi taybetî. Em nabêjin valahiyekê bixin navbera gelê kurd û gelên li navçeyê, çi Tirk bin, an Ereb, an Fars. Şerkirin wê derz û valahiyê çedike. Desthilata Herêma Kurdistanê berpirsyariya xelkê vê herêmê dixe stûyê xwe, lê di heman demê de nabe xelkê din rewşa Herêma Kurdistanê ji bo berjewendiyên xwe yên partîtî bi kar bînin.

Xelkê Kurdistanê êdî şerê Kurd û Kurd qebûl nake, Serokê Herêma Kurdistanê jî çendîn caran ragihandiye ku ev tişt qet pêk nayê. Lê Erdogan daxwaz dike ku Pêşmerge jî beşdarî rûbirûbûna ligel PKKê bibin. Di vê derbarê de çi axaftin hatin kirin û hûn ligel berpirsên Tirkiyeyê li ser çi li hev hatin?

Bêguman dema civînek tê sazkirin gelek tişt tên behskirin, lê tiştê ku dakokî li ser hat kirin meseleya têkiliyên navbera Herêma Kurdistan û Tirkiyeyê bû ku pêwîste bê parastin, ev têkiliyeke stratejîk e. Di heman demê de Serokê Herêma Kurdistanê û berpirsên vê herêmê bi eşkere behsa wê yekê kirine ku nabe şerê Kurd û Kurd çêbibe û xaka Herêma Kurdistanê dijî dewletên cîran bê bikaranîn. Me got ev pirsgirêk bi rêya şer nayê çareserkirin, tevî vê yekê jî nabe li nav xaka Herêma Kurdistanê partiyek hebe ku li gor yasa û raspardên Herêma Kurdistanê kar neke. Duyem em beşeke Îraqê ne û girêdayî destûra îraqî ne. Ne destûra Îraqê rê dide me ku em bihêlin kesên li ser xaka Herêma Kurdistanê vê xakê dijî welatên cîran bi kar bînin, ne yasa me, ne berjewendiya xelkê Kurd li Kurdistanê û li hemû cihan jî vê yekê dixwaze ku

Gotûbêjên nehênî û eşkere di navbera aliyê kurdî û Tirkiyeyê de berdewam in

kiryarên ji vê corê berdewam bin. Ji ber ku di dawiyê de wê zerar bigihije Kurdan û têkiliyên ligel gelên din, herwiha ji bo navdariya Kurdan li cîhana derve jî em nikarin van karan qebûl bikin. Loma em hêvîdar in ku kesên van karan pêktînin bawer bikin ku ev ne rêya gihandina Kurdan e bo armancekê, lê rêyeke bo pêkanîna pirsgirêkên mezin bo Kurdan û Herêma Kurdistanê. Ji xwe ev herêm berpirsyariya hemû aliyane û nabe em vê herêmê ji dest bidin, tenê ji ber ku xelkên din bîrûbaweriyên wan ên cuda hene.

Hevpeyvîn:
Selam Sadî û Hîvîdar Ehmed

www.arsivakurd.org

Huseyin Kartal:

Daxwaza zimanekî yekgirtî ne li cihê xwe ye

Nivîskar û zimanzan Huseyin Kartal xwendina pirtûk û berhemên kurdî ku ne bi latînî, lê bi kurdiya kevin hatine nivîsandin gelek girîng dibîne û bang li nivîskarên başûr dike ku berhemên xwe bi latînî jî biweşînin. Kartal dibêje ku dinya ber bi de-sentraliyê ve diçe û hebûna dilayektan û zaraveyan dewlemendî ye û pêde dice: "Yekîtî û yekkirina her tiştekî pirsgirêkê çareser nake."

Piraniya kesên ku di warê zimanê de dikolin û dixebitin bi paldereke netewî berve karê ziman çûne, çîroka we çawa dest pê kiriye?

Ta radeyekê ez jî ji ber barê netewî berev ziman çûm, lê hin xalên din hebûn, min ji zimanên Rojhilata Navîn hez dikir û min dixwest ez farisî jî fêr bibim. Lê di kurdî de min xwest ez hinek tiştên tarî fêm bikim ka çima ew wisa ne anku meraqek bû ku ez bingeha kurdî fêm bikim û zelal bikim.

Gelo kêşeyên şêwezarê kurmancî çi ne?

Çi zimanek tune ye bê kêşe be û sedî sed xwe zelal kiribe, zimanên ku sed sal e zimanê dewletê ne û bi her awayê projeyan tên birêve birin û ji aliyê milyonan ve tên xwendin û nivîsandin dîsa xwedî kêşe ne. Bi taybet ez ê li ser kurmancî bêjim ku kêşe hene lê kêşeyeke serekî bo kurmancî nîne, ew kêşeyên hene kêşeyên însanan e, kêşeyên kurmancîaxêvan e anku kêşeyên hene yên mirovan e ne yê ziman in. Kêşeyên ziman di çarçoveya xebateke zanistî û akademîk de çareser dibin, jiber ku meseleya ziman tercîh e, kesek wisa peyvekê yan formekê tercîh dike û kesekî din bi awayekî din bi kar tine, ez wan ji kêşeyên ziman bêtir kêşeyên kesan dibînim.

Derbarê kêşeyên alfabeyê de tu çi dibêjî?

Alfabe di her zimanekî de pirsgirêk e, ji ber alfabe ti carî ziman nade der, dengên ziman hene û tîpên ziman hene, dengên ziman ti carî nikarin bi herfan îfadeya xwe tam bikin. Kurd xwediyê 31 tîpan in, lê mirov dikare hinek tîpan jê bixe jî û çend forman di nav alfabeyê bike dîsa çareser dibe. Ji aliyê rêzimanî ve jî tevliheviya ku heyî di serê me de ye ji ber ku ew kêşe ji devokan tê û dema her nivîskarek dinivîse devoka xwe dide pêş. Ev pirsgirêk ne ewqas mezin in, di kurmancî de standart heye û kî binivîse ewê din jê fêm dike.

Derbarê alfabeyê de projeyeke te hebû, ew çawa bû?

Ew ne projeya min e, dema ez hîn 4-5 salî bûm birêz Îsmet Şerîf Wanlî ew pêşniyaz kiriye, mamosteyê min ê gewre Cemal Nebez jî ew pêşniyaz kiriye, ew pêşniyaz tenê guhertina du herfan e: Ş bi SH û Ç bi CH bê nivîsîn. Di praktîkê de ev bi şêweyekî rojane bikar tên di Tweeter û Facebook û e-mail de, ew niçikên wan tîpan bûne bela lê tîpên din ewên bi kumik Û, Ê, Î li gor min acil nîne û çi problema wan nîne. Tîp jî û gramer jî ne tiştekî pîroz in û ewên çêkirine mîna me însan in, divê rê li ber lêkoleran neyê girtin û çi bo pêvajoya zimanî pêwîst be ew bê kirin.

Ji bilî sînorên dijminan di nav Kurdan de danîne, sînorekî din heye ew jî bi kar anîna 2 alfabeyan tu vê çawa dibînî?

Ji ber meseleya 2 alfabeyan, ez gelek xemgîn im ku gelek berhem hene û ez nikarim bixwînim ji ber ew bi alfabeya kurdî ya kevn in, ez nabêjim alfabeya erebî, kurdan ew bi kar anîne lewma ez dibêjim alfabeya kurdî ya kevin. Ya rast jî ez bi xwe dikarim bixwînim lê heta ez pertûkekê bixwînim ez ê 5 pertûkan bi alfabeya latînî bixwînim. Mixabin gelek berhem li başûr hene em ji wan bêpar in, eger wergera bi alfabeya latînî hebûya meyê ew bixwendana bila bi soranî be jî lê bi alfabeya latînî. Daxwaza me daxwazeke însanî ye ku ewqas hejmareke mezin ji Kurdên bakur û rojava ji gelek berhemên li başûr bêpar mane, ji ber em bi wan tîpan nizanin lewma ez ji nivîskarên başûr daxwaz dikim ku berhemên xwe bi latînî jî çap bikin.

Tu çareseriya vê kêşeyê çawa dibînî?

Di konferansa zanistî ya zimanê kurdî li Hewlêrê de, gaveke gelek girîng hate avêtin û ew yek ji raspardeyên wê bû, ku daxwaz dike li Başûrê Kurdistanê li hemû cih û dezgehan li bin tîpên kurdî yên kevin, heman peyv bi tîpên latînî jî bêne nivîsandin. Ev biryar hatiye girtin û ez bawer dikim ku hikûmet jî piştgiriya wê bike ji ber ku ew meseleyeke siyasî ye û ne tenê meseleya ziman e. Di konferansê de 14 rasparde hatine destnîşankirin eger ew bibe bernameyeke praktîkî ya siyaseta Hikûmeta Herêma Kurdistanê û bi alîkariya hemû kesên din ez bawer dikim, evê kêşe hêdî hêdî dê ji holê rabe.

Çi cudahiya vê konferansê û yên din yên ziman hebûn?

Di konferansên berê de jî, gelek lêkolîn û semînerên baş hatin pêşkêşkirin, lê di wan de encameke hevbeş derneket, di vê konferansê de encameke hevbeş ku ji 14 pêşniyazan pêk tên, ew daxwaza hemûyan bû. Kêşeyên me ji wir tên ku em hevdu nas nakin me di vê konferansê hevdu nas kir Taybetmendiya vê konferansê ew bû ku piştgiriyeke mezin ji aliyê hikûmeta herêma Kurdistanê ve bû û ew di bin serpereştiya wezareta rewşenbîriyê de li dar ket û bi taybet ku Serokê Herêma Kurdistanê birêz Mesûd Barzanî bi xwe piştgiriya vê konferansê kir. Ji bo me ev tiştên nû ne cara yekem ku ji aliyê Kurdan aliyê resmî û dewletî rola xwe dilîze.

Di konferansê qet behsa zimanê yekgirtî nehate kirin, gelo we xwe di ser avêt yan bi qenaet ew derbaz kir?

Kurdistan welatekî firereng e, ji aliyê hindikahiyan de û ji aliyê neteweyan de û ji alî olî û her wiha ji aliyê diyalektan ve, lewma em nikarin pirsgirêkê bi biryaran çareser bikin û ne jî bi sentral çareser bikin, dinya êdî ber bi de-sentral ve diçe anku berev herêman de, eger em siberojê de Kurdistaneke bi hêz û xurt û firereng dixwazin pêwîst e em li pirsgirêk firehtir mêze bikin û em federal hizir bikin. Yekîtî û yekkirina her tiştekî pirsgirêkê çareser nake, bo çi zimanekî yekgirtî di vê rewşê de, her kes dibêje zimanê min û hemû jî rast in, lewma eger em hinekî din nêzî hev bibin wê pirsgirêka têgihîştinê nemîne, lewma daxwaza zimanekî yekgirtî ne li cihê xwe ye divê em rê bidin her şêwezarek di nav xwe de xwe pêş bixwe û xwe nêzî yê din bike, divê em dev ji gotinên berî 30-40 salî berdin, ne dinya dinyaya berê ye û ne jî Kurdistan Kurdistana berê ye. Jixwe pêşxistina şêwezarên kurdî pêşxistina berev zimanekî yekgirtî û yek ji daxwazên konferansê ew e, sazkirina ferhengekî yekgirtî di nav hemû şêwezaran de.

Pêşniyaza guhertina du herfan heye: Ş bi SH û Ç bi CH bê nivîsandin.

Yek ji daxwaza konferansê: Sazkirina ferhengekî yekgirtî di nav hemû şêwezaran de.

Alfabe di her zimanekî de pirsgirêk e.



Wêne: Rûdaw

Biyografî

Li Batmanê ji dayîk bûye, bavê wî ji Amedê ye û dayîka wî jî ji Mûşê ye. 30 sal in li Almanya dijî. Xwendina xwe ya derbarê Îranîstîk û Etnolojî de qedandiye. Karê wergerandinê û weşanxaneyê dike. Çend xebatên wî yên derbarê ziman de hene.

Wêne: Rûdaw

Reklam
ZEN-TAX
Steuerberatungsgesellschaft mbH
Tel.: 0221 – 16 83 17 42
Fax: 0221 – 16 83 17 43
e-Mail: info@zen-tax.de
web: www.zen-tax.de
Navnîşan:
Hohenstaufenring 55
50674 Köln

Mihesebeya Malî	Finanzbuchhaltung
Mihesebeya Heqdestê Karkeran	Lohnbuchhaltung
Hesabê Salê	Jahresabschlüsse
Beyanên Bacê	Steuererklärungen
Şêwirmendiya Avakirina Kargehan	Existenzgründerberatung
Karên Din	Sonstige Leistungen

www.arsivakurd.org

Mêrsîn bûye “Kurdistana biçûk”

Ji ber ku piraniya nifûsa Mersînê ji Kurdan pêk tê, Kurd xwe li wî bajarî li xerîbiyê hîs nakin

Wêne: Rûdaw

Abdulhadî Çîçekçî

Wêne: Rûdaw

Emîne Akin

Mêrsîn (Rûdaw) – Yek ji bajarên herî xweş ên Tirkiyeyê Mêrsîn, ji ber nifûsa zêde ya Kurdan êdî dişibe bajarekî Kurdistanê. Li vî bajarê deryayê, nêzî 600 hezar Kurd dijîn û şaredariyek jî di destê Kurdan de ye.

Mêrsîna ku li ber qeraxa Deryaya Spî ye û weke bajarê turîstan tê nasîn, bi hêma, reng û nifûsa xwe ya Kurdan bûye Kurdistana biçûk. Kurdên li vî bajarî êdî Mêrsînê weke “Yavru Vatana” (Kibrisa Kurdan) Kurdan bi nav dikin. Mêrsîn ku yek ji wan bajarane ku Herêma Serbest (Serbest Bolge) û bênder (lîman) lê heye, bi îxracata xwe ya aborî jî bajarekî navdar e. Ji dikandaran heta hala sebze û fêkiyan, ji karmendan heta xwediyê otêl û baran êdî piranî di destê Kurdan de ye. Li tevahiya Mêrsînê hejmara Kurdan nêzî 600 hezar kesî ye. Navçeya Akdenizê ku navçeyeke navendî ye û nifûsa wê ji hemû navçeyên din zêdetir e, dîtina Tirkan pir zehmet e. Li taxên weke Çay, Çilek, Ozgurluk, Yenipazar, Şevket Sumer, Kazanli, Yeni Hal, Sanayi, Siteler ên li Akdenizê, nifûsa Kurdan ji sedî 90 jortir e. Kurd li Tersûsê jî li taxên weke Şahin, Polatli, Hal, Mithatpaşa, Fahretinpaşa de rûdinên. Li navçeya Torosê jî nifûsa Kurdan li taxên weke Demirtaş, Kurdali, Guneykent, Halkent piranî ne.

Kurdan xwe gihandin quntarên Çiyayên Toroso

Kurdên ku nifûsa wan li navenda bajêr pir zêde bûye û Şaredariya Akdenizê bi dest xistine, niha jî berê xwe dane cotyarî û bazirganiya bax, bostan û zeviyên bi bereket ên li ber çiyayên Torosê. Bajarokê Arpaç ku niha nêzî Torosan e û heta 5 sal berê jî kurd hema hema lê tune bûn, niha ji Kurdan re malovaniyê dike û nifûsa Kurdan li du taxên wî bajarokî de ji ya Tirkan zêdetir bûne. Piraniya Kurdên ku niha li Mêrsînê bi kar û barên sebze, fêkî û şînahiyê re eleqedar dibin, hemû sebze û fêkiyên xwe ji gundên tirkan digrin û van sebze û fêkiyan dişînin Hala Stenbolê û li bazaran belav dikin. Hem kesên ku karên komîsyonê dikin, hem bazirgan niha Kurd in. Kurdan qîma xwe bi vê yekê jî neaniye, niha gelek bax, bostan û zeviyên li gundên quntarên Torosê ji xwe re kirê kirine û cotkarî, karên çandiniyê dikin. Piraniya karkerên ku di van zeviyan de jî dixebitin dîsa Kurd in. Herwiha piraniya depoyên nîsk, birinc, nok û berên narinciyeyê jî niha di destê Kurdan de ne. Di bazar û bazirganiya Mêrsînê de êdî serdestî di destê Kurdan de ye.

Herêma Serbest jî ketiye destê Kurdan

Herêma Serbest (Serbest Bolge) û lîman ku karên nakliye, kirîn û firotina alav û amûran bi rêya deryayê dikin jî niha dikeve destê Kurdan. Hem şirketên Başûrê Kurdistanê û hem jî Kurdên Bakurî di Herêma Serbest û lîmanê de şirîkatiya hev yan jî ya Tirkan dikin û di vê bazarê de jî xwedî gotin in. Yek ji Kurdên ku li quntara Torosê ji xwe re zevî kirê kirine Îsmetê Hawêlî ye. Îsmet ji Rûdawê re diyar kir ku heta çend sal şûnde mimkun e ku Kurd Şaredariya Bajarê Mezin a Mêrsînê jî bi dest bixin û wiha got: “Ez li vir karê naneyê dikim. Di zeviyên ku min kirê kirine de karkerên kurd, ereb û tirk didim xebitandin. Lê piraniya karkerên me dîsa Kurd in. Ez naneyên ku li vir diçînim ji Hala Stenbolê re dişînim û bi rêya komîsyonvanên kurd dixim bazarê.” Yek ji karkerên ku li ber destê Îsmetê Hawêlî dixebite Hatîce Era ya tirk e. Hatîce got ku ew ji hevaltiya Kurdan kêfxweş e û ew dixwaze hemû mafên Kurdan ên neteweyî bê dayîn. Yek ji karkerên naneyê Emîne Akin ku ji Rihayê ye, da zanîn ku ew jî karê xwe kêfxweş e lê dixwaze êdî bi sîgorte bixebite. Akin eşkere kir ku ew di nava malbatê de piranî bi kurdî diaxivin, digel ku ew 20 sal in li vir in jî hê zimanê xwe ji bîr nekirine. Karker Abdulhadî Çîçekçî jî bal kişand ku gundê wan li Çinara Amedê bi zora dewletê hatiye valakirin û ew neçar mane berê xwe bidin Mêrsînê. Çîçekçî got ku ji ber piraniya nifûsa Mêrsînê ji Kurdan pêk tê, ew xwe li xerîbiyê hîs nakin û ew vê derê weke Kurdistana biçûk dibînin.

Ji bo anîna zarokan jin diçin ba şehîd Omerê zindî

Saman Beşaretî

Omer Mihemed Qadir (54) dibêje ku berî bordûmana firokeyên Saddam wî birîndar bikin û dûre bixin gorê , kesekî normal bû û ne xwediyê ti şiyanekê û ne ji rêzê bû: “Pêşmergê PDKê li Bane bûm, sala 1984ê firokeyan em bombebaran kirin û parçeyên bombeyan li min û hevalekî min ketin û roviyên min derketin derve, her ewqasî haya min jê heye min bi kemera xwe birîna xwe girêda.”

Wî û hevalên wî dibin nexweşxanê li Îranê, qaşo herdu mirine: “Weke ji min re behs kirin pêşî hevalê min hat binaxkirin û dûre ez, di wê dema ku min xistin gorê de, êdî ji hingî ve weke Şehîd Omer têm naskirin.”



Wêne: Rûdaw

Omer qala wan 3 saetên mirina xwe dike: “Peyamek gihişte min bêyî ku bizanim kî ye û ji ku hatiye, deng ji min re got êdî dikarî jinên ku zarok ji wan re nabin rizgar bikî.” Bi gotina xwe niha ew dikare tenê bi temaşekirinê bizane zarok ji jinekê re dibin an na.

Navbirî got: “Peyamnêr şêweyê çareserkirinê jî ji min re got, bi rêya xwarina goştê jîjo û xwîna wî, jin dikare bibe xwedî zarok.” Ew dizane ku ev bi hêsanî nayê bawerkirin, lewma hejmara mobîl û navnîşana zêdeyî 300 ji wan jinan li ba xwe arşîv kiriye, ku dibêje alîkariya wan kiriye: “Jinên wiha hene piştî 8 caran mêrkirine zarok jin wan re nebûne, lê piştî ku hatine cem min niha xwedî zarok in.”Kalê Resşl (24), piştî 5 salên mêrkirinê, bû dê û dibêje: “Doktorek nema ku ez lê negerim û serdana wî nekim, lê bêsûd bû. Gava hatim ba şehîd Omer ji min re got, wê zarok ji te re çêbibin, here jîjoyekî bixwe û xwîna wî vexwe, min jî wisa kir û piştî mehekê dûcanî bûm.”

Şehîd Omer dibêje şiyana xwe bo dewlemendbûnê bikar nayîne û heya vêga jî bi wan pereyan dijî.

Razaw Hesen yeka din ji wan jinan e ku piştî 10 salan ji zewacê, bi rêya çareseriya Şehîd Omer bû dê: “Şehîd Omer ji min re got jîjoyekî bigirin û gava we serê wî jêkir, xwîna wî tenê bi qasî qedeheke çayê divê vexwî û dûre jî goştê wî bixwe, min jî ev kir û piştî 8 mehan zarokê min çêbû.”

Pizîşk çi dibejin?

Rêvebera nexweşxaneya jidayikbûnê li Silêmaniyê Şilêr Fayq Xerîb, derbarê talentên Omer dibêje: “Em weke zanista pizîşkî nikarin ji wê yekê bawer bikin ku Omer dike, lê hinek ji wan kesên ku zarok ji wan re çênabin, pirsgirêkên wan ên derûnî hene û gava diçin ba kesekî wiha, ewqasî dilê wan dikeve cî ku êdî zarok ji wan re çêdibe. Hinek ji wan jinan lewma li ba me sûd ji dermanan wernagirin, jiber ku bi bawerî nayên ba me, her weke çawa bi bawerî berê xwe didin ba şêx, mele û oldaran.”

Sererastkirin

Di hejmara borî ya Rûdawê de (hejmar 118), di rûpela 7ê de, bi sernavê ***"Îkram ji mirinê xilas bû"*** nûçeyek hat belavkirin. Mixabin di nûçeyê de agahiyek şaş hatiye belav kirin û em wê yekê wekî li jêrê sererast dikin û lêborîna xwe ji xwendevanan û birêz Faxer Sindî dixwazin:

Di nûçeyê de ji zardevê Serokê Komela Kultura Kurdî li Munchenê (K.K.V) birêz Faxer Sindî wiha hatiye nivîsîn: "Min bi navê komeleyê di roja 11ê Kanûna 2008ê de ji serokê Buroya Hikûmeta Herêma Kurdistanê li Berlînê Dilşad Barzanî re bo alîkariya peran nameyek şand. Birêz Barzanî tenezul nekir ku persiva me jî bide."

Lê birêz Faxer Sindî bi rêya telefonê ji Rûdawê re piştrast kir ku di vir de axaftinên wî şaş hatine nivîsandin û wî negotiye ku "birêz Barzanî tenezul nekir ku persiva me jî bide", lê wî gotiye: "Piştî ku bersiv ji Nûnerê Hikûmeta Herêma Kurdistanê li Berlînê birêz Dilşad Barzanî nehat, min telefonî Dilşad Barzanî kir û wî ji min re gotiye ku ji ber tunebûna demê mixabin wî dem nedîtiye ku bersivê bide û herwiha Dilşad Barzanî gotiye ku ew weke Nûnerê Hikûmeta Herêma Kurdistanê li Berlînê nikare di vî warî de alîkariyê bide, lê divê di wî warî de serî li Wezareta Tendirustiyê ya Hikûmeta Herêma Kurdistnanê bê dayîn."

Faxer Sindî herwiha got ku malbata Îkram beriya ku daxwaza alîkariyê ji Komela Kultura Kurdî li Munchenê (K.K.V) bike, malbatê li Başûrê Kurdistanê daxwaza alîkariyê ji çendîn dezgeh û saziyan kiriye, lê ew alîkariya pêwist ji wan re nehatiye kirin û li ser vê yekê malbatê alîkarî ji wan weke Komela Kultura Kurdî li Munchenê (K.K.V) xwestiye û wan jî soza alîkariyê daye malbata Îkram.

Di hejmara 117 ya Rûdawê de, di rûpela 6ê de, bi sernavê ***"YEK-KOMê 60 hezar îmze kom kirin, lê hayê Kurdan jê nîne"*** nûçeyek hat belavkirin. Mixabin di nûçeyê de agahiyek şaş hatiye belav kirin û em nûçeyê wekî li jêrê sererast dikin:

Di nûçeyê de wiha tê gotin ku Kenar Xan li ser navê Nûnertiya PDKê li Almanyayê daxuyanî daye. Lê ev yek şaş e û Kenar Xan weke fermanber di Nûneratiya Hikûmeta Kurdistanê li Berlînê de kar dike û Kenar Xan di Nûnertiya PDKê de kar nake. Ji bo vê agahiya şaş em lêborîna xwe ji xwendevanan û Kenar Xan dixwazin.

Daxwaziyên Tirkiyeyê ji Herêma Kurdistanê çi ne?

Rêbiwar Kerîm Welî

Ji destpêka Tîrmeha îsal şepêleke girtin, tundûtîjî û pêkdadanê navbera Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) û hêzên emniyên Tirkiyeyê çêbûn. Herî dawî jî êrîşa PKKê ya li navçeya Çelê ser bi Eyaleta Colemêrg bû ku piştî sala 1993yê ev çalakî ji aliyê hejmara kuştiyên leşkerên tirkan mezintirîn çalakî bû. Li himber vê jî hêzên polîsên tirkan, ji bilî ku mil bi milê leşkerên tirk beşdarî êrîşan dibin, wan di hundir de jî dest bi girtinên reş kirine û bi sedan çalakvanên kurd bi navê "dosya KCKê" şandine zîndanan. Ev bi rengekî tê kirin ku mîna serkirdeyekî PKKê van rojan ji min re got ku ew di wê baweriyê de ne ev girtinên siyasî yên tarî yên niha li Tirkiyeyê hene di serdema darbeya 1980î de jî nebû!

Êrîşa PKKê ya chekdarî ya dawî Tirkiye hejand, lê reaksyona Herêma Kurdistanê jî gelekî tund bû, bi coreyekî bû ku birêz Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî di peyama xwe ya protestokirina vê êrîşê de ev kiryar weke "tawan" bi nav kir. Mîna ku di wê peyamê de hatî, di wê demê de hewldan hebûn bo zemîndanîna çareseriyeke siyasî. Serokatiya Hikûmetê jî herwiha ev êrîş protesto kir. Piştî vê jî Nêçîrvan Barzanî bi nûnertiya Serokê Herêma Kurdistanê li ser daxwaza Serokwezîrê Tirkiyeyê serdana Enqere kir û ligel Wezîrê Derve û Serokwezîrê Tirkiyeyê civiya û hat ragihandin ku Serokê Herêma Kurdistanê jî wê di van nêzîkan de serdana Enqere bike. Daxwaziya Tirkiyeyê ji Herêma Kurdistanê alîkarîkirina Herêma Kurdistanê ye di rûbirûbûna leşkerî ligel PKKê. Lê ev çiqasî mimkun e?

> **Tirkiye ji Herêma Kurdistanê dixwaze li dijî PKKê alîkarî bide wan, lê ev çiqas mimkûn e?**

Li gor çavkaniyên tirkî yên haydar, plana Tirkiyeyê ev e: bi hêza leşkerî hemû wan cihên Herêma Kurdistanê dagîr bike, yên ku desthilata Pêşmerge û hêzên ewlehiya Kurdistanê li ser nîne, alîkariya PKKê neyê kirin ku êrîşî wan bike û rê jî ji PKKê re neyê dayîn ku êrîşan pêkbîne. Ev in kurtiya daxwaziyên Tirkiyê ji Herêma Kurdistanê. Li himber vê jî de Tirkiye soz dide ku her dema Herêma Kurdistanê îmkana kontrolkirina van navçeyan hebû, ku niha di bin desthilata PKKê de ne û PKKê navê "Herêmên Parastina Medya" lêkirine û ji aliyê Tirkiyeyê jî weke herêmên parastinê tên binavkirin, wê Tirkiye wan bide destê Pêşmerge û Hikûmeta Herêma Kurdistanê.

Li gor wê çavkaniya tirkî, bersîva şanda kurdî bi vî şêweyî bû: Herêma Kurdistanê di warê bikarneanîna xaka wê bo lêdana cîranan hest bi berpirsyariya xwe ya navnetewî dike, hêza Pêşmerge jî beşdari şeran nabe û piştevaniya ti aliyekî jî nake. Çareseriya vê pirsgirêkê tenê yek rêya wê heye, ew jî rêya çareseriya aşîtiyane û siyasî ye, bila Abdullah Ocalan ji vê rewşa niha ew têde bê derxistin û rewşa wî bê baştir kirin û gotûbêj li gel bên kirin.

Tirkiye di mesela PKKê de li pey du armancên sereke ye

Yekem: Ji aliyê hundirîn berî ku destûrê nû bê danîn, bi rêya lêxistina PKKê astê daxwaziyên Kurdan di destûra nû de bîne jêr.

Duyem: Ji aliyê derve PKK bûye karteke goşarê li ser rêya siyaseta derve ya Tirkiyeyê de, şer û pêkdadanên ligel artêşê giraniya Tirkiyeyê derbarê siyaseta derveyî û navçeyî kêm dike, loma Tirkiye dixwaze vê goşar ji ser siyaseta xwe ya derveyî nehêle.

Eger ev du armancên Tirkiye yên giştî hebin, PKK jî bi heman şêweyî dixwaze bi rêya çalakiyên çekdarî goşarê bêxe ser Tirkiyeyê ku:

Yekem: Ocalan eger neyê azadkirin jî, bila bixin zîndana malê de.

Duyem: PKK û Ocalan weke tek muxatabên pirsgirêka Kurd bi şêweyekî fermî bên qebûl kirin û danûstanên eşkere ligel wan bên kirin.

Herêma Kurdistanê nikare ti alîkariya leşkerî bide Tirkiyeyê, ji ber ne serkirdayetiya siyasî di wê baweriyê de ye ku ev pirsgirêk wê bi şer çareser bibe, ne raya giştî ya Kurdistanê jî rê jê re dide, loma çûna Barzanî bo Enqere tenê bo pêşxistina çareseriya siyasî dikare sûdmend be, lê li wê rêya ku Tirkiye dixwaze tiştek şîn nabe. Rola ku berê Herêma Kurdistanê di mesela agirbesê de hebû, bo PKKê, Tirkiye û Herêma Kurdistanê jî girînge ku berdewam be. Bi dawî hatina vê rolê berî her kesî wê zerar bighije PKKê, alozbûna rewşa navçeyên Kurdên li Tirkiyeyê û nemana çalakiyên berfireh ên sivîl jî nîşanên vê rastiyê ne. Lê diyare PKK êdî ne amade ye agirbestê îlan bike, ji bilî sedemên herêmê. Ji ber ku hem konjuktûra navnetewî di qadê de namîne, hem jî leşkerê Tirkiyeyê ew germî û îmkana berê nemaye û êdî şerma PKKê jê şkestiye.

PKK weke dewleteke mobîl lê hatiye û diyar kiriye ku ne BDP û ne ti kesayetiyeke siyasî ya Kurd li Tirkiyeyê însyatîfa wan nîne ku bi navê Kurdan biryar bidin, loma Tirkiye di dawiyê de divê bigihe wê baweriyê ku hemû rê li ba Ocalan û rewşa wî de bi dawî dibin. Ocalan eger ji Îmralî bê derxistin û derfetên manorî pê bê dayîn, wê aveke sar bi vî agirî de bike ku Tirkiye girtiye, PKK jî wê çekan deyne û Tirkiye ji bela vî şerî rizgar dibe. Herêma Kurdistanê jî di vê rêbaza siyasî de dikare roleke mezintir bilîze.

Bêyî hesta neteweyî dewlet çênabin

Rizgar Kêsteyî

Bawer dikim her kes baş dizane ku em Kurd mezintirîn gel in li ser rûyê cîhanê ku heya niha maye bê dewlet. Gelek caran em vê çarereşiya xwe dikin situyê dijminan, welatên bihêz, dîrok û gelek hincetên din yên ji vî rengî, lê hemû gelên cîhanê yên xwedî dewlet weke me ev astengî û karekter li ber wan jî hebûn, lê belê dîsa jî ew bûn dewlet.

Gelek caran dema ku em xwe ji kesên biyanî re didin naskirin û ji wan re diyar dikin ku em gelekî ewqasî mezin in û welatê me hatiye parçekirin û dijminan gelek zordestî li me kirine û nehiştine heya niha em bibin xwedî welatekî serbixwe, em vê ji bo xwe weke serbilindî dibînin! Lê ez bi xwe weke Kurdekî hertim ji xwe şerm dikim ku em milletekî ewqasî mezin in û me nekariye di hemû dîroka xwe de dewleteke xwe ava bikin.

Dema mirov hûrtir hizra xwe tê de dike, digihe wê baweriyê ku kêmasiyek me Kurdan bi xwe heye ku nehiştiye heya vêga em bibin xwediyê dewletê.

Bi dîtina min ew kêmasî jî nebûna hesta neteweyî ye li ba me Kurdan e. Dibe ku ev dîtina min bo gelek kesan ecêb be û bêjin: çawa piştî ewqas şoreş û xebat û qurbanîdanan, hê jê hesta me ya neteweyî nîne?

Lê em dibînin ku hest û dilgermiya me ji bo ola me, ji bo eşîra me û ji bo devera me gelek xurtir e ji hesta me ji bo neteweya me, wisa bo me diyar be ku hesta neteweyî di nav me de yan gelekan lawaz e yan jî her nîne.

Fîlozofekî wekî Ehmedê Xanî berî zêdeyî 300 salan di nav me de derketiye û bi ciwantirîn û bihêztirîn rengî hizra neteweyî di qalibê helbestên xwe de bo me darêştiye, lê sed mixabin di van her 300 salan de zanayekî din yê Kurd nederket ku li vê ramanê bibe xwedî û wê di qalibê bîrdozeka neteweyî de darêje da ku di çarçoveya wê de xebat bê kirin ji bo serxwebûnê.

Ji ber ku hesta neteweyî bingeha herî qayîm a dewletbûnê ye û tenê ew dikare miletan ji parçebûn, belavbûn û serwindabûnê rizgar bike û li ser yek rêbazê kom bike û berê wan bide armanca wan ya bilind ji bo serxwebûnê, lewma divê em jî berî qala dewletbûna xwe bikin, em hewl bidin hesta neteweyî di nav gelê xwe de xurt bikin û wê bikin bingeha xebat û bizavên xwe.

www.arsivakurd.org

Ziwakirina boyaxa neynûkan jinan bi kanserê dixe

Li gor nûçeya CNNê sedemê kansera çermê dora neynûkan boyaxa ziwakirinê ye

Pisporên warê nexweşiyên çerm jinan hişyar dikin ku bikaranîna amûra ziwakirina boyaxa neynûkan ku bêtir di salonan de tê bikaranîn, egera derketina kansera çerm zêde dike.

Malpera Hels ji arşîva nexweşiyên çerm belav kir ku ziwakirina boyaxa neynûkan bi amûra ziwakirinê, karakterekî bive yê derketina kanserê ye.

Li gor raporeke tora CNN, pisporan bala xwe dane wan raporên ku amaje didin zêdebûna derketina kansera çerm li navçeyên di ser neynûkan re, ev jî bêtir rastî wan jinan tê ku bênavber li salonan amûra ziwakirina boyaxa neynûkan bikar tînin.

Li Çînê rêjeya mirina zarokan dadikeve

Ji ber serkeftina bernameya saxlemiyê ya ku li Çînê hat meşandin bo dafdana dayikan ku di dema çêbûna zarokan de herin nexweşxaneyan û ji zarokanîna nav malê dûr bikevin, rêjeya mirina zarokên ji nû jidayikbûyî di sala 2008ê de bo 9.3 zarok ji her 1000 zarokan daket, di sala 1996ê de ev rêjeya mirina zarokên nû jidayikbûyî li Çînê 27.7 zarok bû ji her 1000 zarokan.

Ev hejmar jî Çînê dike heştemîn welatê cîhanê di aliyê nizimiya rêjeya mirina zarokên nû jidayikbûyî. Li gor îstatîstîka rêxistina UN bo zarokan, di vî warî de Brîtanya di pileya sêyemîn, Amerîka di pileya çaran û Singapur jî di pileya yekê de ye.

Ji sala 2008ê ve piraniya jinên Çînê bo anîna zarokan berê xwe didin nexweşxaneyan, lê di sala 1988ê de tenê nîvê jinên Çînê bo welidandinê diçûn nexweşxaneyan.

Bihnvedan baştirîn çareseriya serêşa berdewam e

Eger tu yekî ji wan kesên ku `şeqîqeya` (nexweşiya serêşa berdewam) te heye û dixwazî azarên wê te bêzar neke êdî pêwîst e ji dêvla mijûlî û çalakiyên hûr hiş û rojane hewl bidî mejiyê xwe rehet bikî. Ev rênîşan û şîretkariya profesor Hartman Cobl yê rêveberê pizîşkî yê navenda Kiel li Alamanya ye.

Profesor Cobl dibêje ku parastina sîstemeke rojane, bernameyekî berdewam bo xwarinê, diyarkirina demên bihnvedanê bi rêjeya ji sedî 50 heya ji sedî 70 dibe sedemê çareseriya şeqîqe û azarên wê ku bi derman çareser nabe. Cobl amaje da wê yekê jî demên bihnvedan û hebûna sîstemeke rojane di jiyana her kesekî de corekî aramiyê di hişê zêde bikarhatî de yê wan kesan de çê dike ku serê wan bi berdewamî diêşe, lê hişyarî jî da ku eger kesek hest bi serêşa zêde kir êdî pêwîst e derman werbigire.

Sîstema bergiriya jinan bihêztir e

- Ev sîstema jinan ji ya mêran xurttir e.
- Temenê jinan ji yê mêran dirêjtir e.
- Pêwendiya kromozoma X bi sîstema bergirî heye.

Nûtirîn lêkolînê kifş kir ku sîstema bergiriya laşê jinan ji ya mêran xurttir e ji ber pirtikên di DNAyê de hene li ser tuxmê kromozoma X ku di jinan de du heb in û di mêran de yek e.

Hejmareke zanayên zanîngeha Gent ya Belcîkî lêkolînek ser rola pirtikên maykrorna çêkirin, bi mebesta kifşkirina sedemê wê yekê ji ber çi jin ji mêran bihêztir in di warê sîstema bergiriyê û herwiha temenê wan jî ji yê mêran dirêjtir e. Di vî warî de Clod Lebert eşkere kir ku îstatîstîkên wan dane zanîn ku jin ji mêran temendirêjtir in û herwiha zêdetir li ber xwe didin bo kirîza dil û pîsbûna xwînê. Lebert sedemê vê yekê bi kromozoma X ve girêda ku di mirov de ji sedî 10 pirtikên maykrorna tê de hene. Navbirî diyar kir pir rola van pirtikan heye ku hê nehatiye kifşkirin, lê hinek ji wan hatine zanîn li ser kromozomê X ku pêwendiya wan bi sîstema bergirî û kanserê ve heye.

Xaçepirs

Çeperast: 1- Nanê tenik, li ser sêlê çêdibe – Derman, reketkirin, rê û rêbaz. 2- Terefdarî, rêzgirtin – Rakirin, veşartin. 3- Kesên ji Nîjeryayê – Bijî, her bijî, bravo. 4- Raste, erê, helbet (berepaş) – Bi Erebî "kêmnetewe, grûp" – Notayek muzîkê. 5- Zixt, tirsandin – Bi Tirkî "tu". 6- Zadê reş, zerzewatek ku jê nan çêdibe (berepaş) – Notayek muzîkê (berepaş) – Ji bo, ji ber, li ser. 7- Aram, rehetî, kemilî. 8- Rû bi rû, rasterast (berepaş) – Pêvok û gotina îdeolojîyekê. 9- Werz, bax û bîstanê trî – Roja xutbê. 10- Jan, eza, derd – Hezkirîyê Zînê Memê...., navekî zilaman – Kanî, bide min, bîne (berepaş).

Serejêr: 1-Jin di tenûrê de dipêjin, cûreyekî nan. 2- Navekî jinan (berepaş) – Renqek, qer. 3- Leqandin, destlêxistin (berepaş) – Rûnê hişk, tewaş, parçeyê rûn. 4- Qehremanekî şewata sînema Amûdê (berepaş). 5- Tiştên veşartî û negotî, gîzem – Welatê Cihû û Yahûdîyan. 6- Navekî jinan, weke teyr (berepaş) – Du tîpên gotina "kar". 7- Razî, dilxwazî (berepaş) - Kûçik, seg – Rojek. 8- Çîçekek, navekî jinan. 9- Sextekar, Beko Ewan, dolabgêr. 10- Pirsek – Giranî, gîhayî, sergiranî, têgihiştinî (berepaş). 11- Di artêşê de hêzek. 12- Paşmayî, firêze, qirş û qalên ji ber zad mayî (berepaş). 13- Lib, yekane (berepaş). 14- Sebze û nebatek bi dendik û bêhn. 15- Şêt e, aqilê xwe xwariye, bêaqil e (berepaş). 16- Tûj, hat.



Bersivên hejmara 118

www.arsivakurd.org

Tu jî dixwazî wêneyê xwe li vir bibînî?
Ji me re bişîn: info@rudaw.eu

Masiyên Bedirxan çîrokan fêm dikin

Bedirxan her şev beriya razanê ji masiyên xwe re çîrokekê dixwîne. Bedirxan dibêje: "Bavê min ji min re gotiye ku masî ji çîrokên te fêm dikin, ji ber wê ez her êvarê ji masiyên xwe re çîrokan dixwînim." Bedirxan 7 salî ye û diçe pola duyem, lê xwestekên Bedirxan gelekî mezin in. Bedirxwan dema mezin bû dixwaze ji zarokan re lîstokan biafirîne.
Ji 4 saliya xwe ve Bedirxan tevlî xuşka xwe Rojîn-Sara wêneyan çêdike. Hinek wêneyên Bedirxan di rojnameyan de jî hatine weşandin û niha dixwaze pirtûkek wêneyên xwe amade bike. Bedirxan ne tenê wêne, lê du salan jî tevlî kursa avjeniyê bû û niha baş dikare avjeniyê bike. Tevlî van hemû hobbyan, Bedirxan ji lîstina futbolê jî gelekî hez dike. Bedirxan gelekî ji xuşka xwe Rojîn-Sara jî hez dike. Lewma hevala Bedirxan a herî nêzîk Rojîn e.

Kerê dengxweş

Demekê kerek hebû, dengê wî gelekî ne xweş bû. Dema wî li dengê ajalên din guhdar dikir, ji xwe aciz dibû, herdem difikirî û ji xwe dipirsî: "Ev ajal çi dixwin ku dengê wan evqasî xweş e?" Kerê deng nexweş êvarekê li ser rêya xwe komek sîsirk (çirçirk) dîtin ku bi hevre digotin "çir…çir…çir". Ker çu cem sîsirkan û ji wan pirsî: "Gelo hûn çi dixwin ku dengê we ewqasî xweş e?" Sîsirkan bi hev re gotin: "Em qet tiştekî naxwin, tenê em ava pîs vedixwin." Ji wê rojê û şûnde ker qet tiştek nexwar, hertim ava pîs vexwar. Lê di dawiyê de ker ji birçîna mir û ti carî dengê wî xweş nebû.

Ev çi ajal e?

Beraz e, an kêvroşk e? Birengîne û bizane.



Welatê me
Merîwan



Bajarê Merîwan yek ji bajarên xweşik ên Kurdistanê ye. Merîwan girêdayî parêzgeha Sine li Rojhilatê Kurdistanê ye. Gola Zirêbar nêzîkî bajarê Merîwan e û çiyayên dora Merîwan bi daristanên xweşik hatine xemilandin. Di demên borî de bajarê Merîwan weke navenda guhastin û hatinûçûyina kerwanan xwedî rol bûye. Îro Merîwan navendeke bazirganî, turîstîk a girîng e li Îranê û pêwendiyên bazirganî yên xelkên bajêr bi Başûrê Kurdistanê re gelekî xurt in.

Amedekirina rûpela zarokan:
Sevda Şafîk



www.pertukakurdi.org